Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1375 | 10-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Leyla Qasim efsaneyek ku di dîrokê de nemir bûye

**Hêvî Keleş/Qamişlo**

**Jina Kurd a têkoşer Leyla Qasim, yekem jina ku li Iraqê ji aliyê rayedarên Partiya Baas a Iraqê ve, hate darvekirin. 52 sal li ser salvegera şehadeta wê re derbas bû, lê her ew efsaneyeke ku di dîrokê de nemir bûye.**



Jina Kurd Leyla Qasim di 27'ê Berfanbara 1952'an de li Banmilê, taxeke Xaneqînê ji dayik bûye. Wê dixwest hebûna xwe wekî mînakek rastîn a jinên Kurd ên wêrek ku karakterê xwe yê jinan îspat kirine û ji doza xwe ya neteweyî îlhamê digirin, ji cîhanê re îspat bike.

Ji vir Leyla Qasim, xwest ji her kesî re tekez bike ku jina Kurd bi tu awayî neheqî, zilm û destdirêjiya li dijî hebûna wê ya mirovî û neteweyî, qebûl nake û tehemûl nake. Her çend ew bi hêza qamçiya xwe û şiyana xwe hewl bidin û li dijî armancên me bisekinin jî, wê bi dengekî bilind qêriya û got: Mîna hemû mêrên dilsoz ên ku xwîna xwe ya hêja feda kirin da ku li hember vê neheqî û vê zilmê bisekinin, ku bi awayekî eşkere li dijî gelê Kurd ê aştîxwaz, nemaze di warên civakî, siyasî, çandî û mirovî de, ji aliyê alîgirên desthilatdariya xwînmij a Bexdayê ve, bi rêbazên cûrbecûr ên wekî kuştin, girtin, qirkirin, îşkenceya laşî û koçberkirina bi darê zorê ya Kurdan û sirgûnkirina wan ber bi Başûr, dûrî deverên wan ên dîrokî yên rûniştinê, bi bêrêziyeke eşkere li dijî gelê Kurd ê aştîxwaz dihat kirin. Dibe ku ax, kevir û çiya jî qet ji lepên vê rejîma xwînmij a ku qet tîbûna xwe ya zilm û zorê li ser Kurdan têr nekir, nehatine xilas kirin.

Ev hemû bû sedem ku Leyla Qasim bi hemû dilsozî û baweriyê biryara xwe ya çarenûssaz bide ku bikeve qada jiyana siyasî û rêxistinî, da ku di destpêkê de tevlî saziyên Yekîtiya Xwendekarên Kurdistanê li herêma Xaneqîn bibe. Bawerî û îman motîfa rastîn bû ku li kêleka hevalên xwe yên xwendekarên Kurd rawestiya da ku wan şiyar bike û hesta neteweyî di kûrahiya wan de bêtir geş bike, ji bilî êşa xwendekarên Kurd û ji bo rakirina neheqiyan ji ser wan wekî xwendekar û ji ser milên gelê Kurd li Iraqê bi giştî bixebite. Bê guman ew xwedî hestek tijî berpirsiyariya dîrokî bû ku li ser milên wê û hemû Kurdên dilsoz bû, ku ev yek wê bi hesta xwe ya neteweyî û mirovî han da ku heta nefesa dawî ya jiyana xwe fedakariyê bike da ku zilm û zordariya li ser hevalên xwe yên Kurd rawestîne, ku ev yek wê di warê rewşenbîrî û siyasî de pêş bixe.

Ev hemû sedemek sereke bû ji bo tevlêbûna wê bi xwendekarên dibistanê re û veguhestina wê bo zanîngehê li paytext Bexdayê, da ku xwendina xwe li Koleja Hunerê, Beşa Sosyolojiyê li Bexdayê temam bike, bi baweriyeke tevahî tevlî refên (Partiya Demokrat a Kurdistanê) bibe da ku bi awayekî çalak beşdarî wê bibe, vê carê bi endamên partiyê re û di asta fireh a xebata rêxistinî û meydanî de têkoşîna xwe ji nû ve bide destpêkirin.

**"Kurdistan ji bo min ji çav û canê min biqîmettir e"**

Ji ber bûyerên siyasî yên ku di sala 1974"an de li herêmên Kurdistanê qewimîn û tundtirbûna şopandina ewlehiyê ya alîgirên partiyê li bajarên cuda yên Iraqê, di nîvê şeva 24'ê Nîsana 1974"an de, wekî beşek ji rêze girtinên rêxistinkirî, dewriyeke ewlehiyê ya bi personel û amûran êrîşî mala (Leyla Qasim Hesen) li Bexdayê kir, ku ew bi malbata xwe re lê dijiya. Wan tevahiya taxê dorpêç kir da ku wê bi îdiaya endamtiya Partiya Demokrat a Kurdistanê li Iraqê, heta roja îro nehatiye eşkerekirin ka ew çawa hatiye naskirin, wê ji mala wê bigirin, bi dest û çavên girêdayî birin yek ji navendên ewlehiyê yên li Bexdayê. Li wir, lêpirsîn dest pê kir, ku di dema wê de wan her rêbazek hovane û nemirovane bikar anîn da ku bi zorê, di bin îşkenceya herî hovane ya fizîkî û psîkolojîk de, îtîrafên wê bistînin.

Lêbelê, şehîd Leyla Qasim, bi berxwedaneke bêhempa, red kir ku tiştekî li xwe mikur bê an jî ti agahiyek, biçûk an mezin, ku dikare zirarê bide hevalên wê yên di Partiya Demokrat a Kurdistanê de, ji celadên wê yên hov re eşkere bike. Berevajî vê, wê ji hemûyan re ragihand ku "Kurdistan ji bo min ji çav û canê min biqîmettir e." Di 12'ê Gulana 1974"an de, ew bêyî darizandineke qanûnî, li heman cihê girtinê, kêmtir ji du hefteyan piştî girtina wê, hate darvekirin. Dema ku wê xwe ji bo welatê xwe, Kurdistanê feda kiribû, çavê wê yê rastê hatibû derxistin û laşê wê bi îşkenceya giran a ku wê di dema girtinê de kişandibû, bi hovane hatibû parçekirin.

Leyla Qasim, ku wê demê 22 salî bû, keçeke Kurd bû ku di 29'ê meha 4'an de sala 1974"an de bi hinceta girêdana wê bi şaneya Partiya Demokrat a Kurdistanê li Bexdayê re hate girtin. Berî darvekirinê, şehîd Leyla Qasim rastî îşkenceya psîkolojîk û fîzîkî hat. Ew ji malbateke şervan dihat ku bi dîroka xwe ya têkoşînê serbilind bû û şehîd ji ber evîna xwe ya ji bo Kurdistanê, welat û dozê endamê Partiya Demokrat a Kurdistanê û Şoreşa Rizgariya Îlonê bû.

Gotina Dawî



Mihemed Seydi

## Li Hesekê çi diqewime?

Hefteya derbasbûyî de, çend bûyer qewimîn ku mirov divê li ser raweste. Dosiya şervanên QSD'ê yên êsîr, mijara Avahiya Dadweriyê li Hesekê û paşguhkirina Zimanê Kurdî û xususiyeta Kurdan li herêmên wan. Li gorî agahiyan, heta niha jî bi sedan şervan û ciwanên Kurd ên Li Şêxmeqsud, Tebqa, Reqqa û Dêra zorê hatî girtin, êsîrin di destê desthilata HTŞ'ê de û ji bo berdana wan bazar tê kirin. Li gorî peymana 29'ê Çileya 2026'an, diviya bû niha hemû êsîr bihatana berdan û koçber vegeriyana cih û warên xwe. Lê heta niha ne hemû koçberên Kurd vegeriyane Efrînê û ne jî riya çûyîna Serêkaniyê hatiye ewlekirin. Li beramberî wê, HTŞ'ê dixwaze hemû saziyên sereke yên herêmê di bin navê dewletê de, xwe lê bi cih bike, bixe bin serweriya xwe û kesên ser bi xwe ve lê wezîfedar bike. Mijara Dadweriyê ku xaleke di jiyanê de herî girînge, HTŞ'ê dixwaze kesên cihadîstên selefî lê bike berpirs û hukmê xelkê herêmê bixe destê wan. Hîne li ser vê mijarê nîqaş dihatin kirin û helwesta ku wê neyê qebûlkirin di rojevê de bû, me dît ku tabêleya bi zimanê Kurdî û Erebî li ser avahiya Dadgeha giştî ya Hesekê hat rakirin û li şûna wê ya bi zimanê Erebî û Înglizî hat danîn. Li pêşiya avahiyê, hinek rojnamevanan ji kesên berpirsên ser bi HTŞ'ê ve dipirsîn, gelo zimanê Înglîzî ji bo kê hatiye danîn ger hûn Kurdî qebûl nakin?

Li hember vê gava şofînist a HTŞ'ê, û piştî belavbûna nûçeya rakirina tabêleya bi zimanê Kurdî, ciwanên Kurd berê xwe dan cihê bûyerê û gotin ku tişta ku Kurdî tê de tune be ew qebûl nakin û zimanê Kurdî xeta sor e. Piştî wê, kesekî ser bi HTŞ'ê ve ku niha bi erka cîgirê parêzgarê Hesekê hatiye wezîfedarkirin bi navê Ehmed El-Hîlalî, derdikeve û dibêje ku zimanê Erebî zimanê fermî yê yekane yê dewletê ye û nabe zimanekî din li ser tabêleyên cihên fermî hebe. Lê kesî ji Hîlalî nepirsî, ger ev bersiva te wiha ye, gelo çima zimanê Înglizî hatiye danîn? Gelo ew jî zimanê fermî yê dewletê ye an li Hesekê xelk bi Înglizî diaxivin?

Ji ber bertekên Kurdan ên li hember vê şofîniyê, hêjmarek êsîr ku diviya bû beriya demekê bihatana berdan û her berdana wan dihat paşxistin, di 8'ê Gulanê de hatin berdan. Heman şeva berdana van Êsîran de, careke din Tabêleya tenê bi zimanê Erebî hat daliqandin û wekî bibêjin ku vaye xelk bi berdana şervanan re meşxule, ew ê kes tabêleyê nebîne. Lê ciwanên Kurd li ser meselê ranezan û careke din berê xwe dan avahiya Dadgehê û tabêleya kuk hatibû daliqandin bi erdê dan. Li vir ya ku bala me dikşîne ew e ku her dema HTŞ'ê dixwaze tawîzan ji Kurdan bigre, dosya êsîran de zextê dike û wekî kert bi kar tîne. Lê ger peyman hebe û xalên wê zelalin û garantor jî hene, çima li gorî wê li ser erdê pêk nayê? Ger li hevkirin heye û hevdûqebûlkirin çêdibe, çima heta niha şervanên QSD'ê êsîrin? Çima Koçberên Kurd venagerin cih û warê xwe? Ger ev dosiyên sereke nehatine çareserkirin, wê demê pêşeroj şîloye û dibe ku di her kêliyê de guhertin pêk werin û herêm dîsa tevlîhev bibe.

Sudoku:Pirs 75

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 2 | | 5 | 3 | 4 | |
| | | 4 | | | | 1 | | 5 |
| 5 | | | 1 | | 7 | | | |
| 1 | | | | | | 5 | 7 | |
| 4 | | | 3 | | 9 | | | 2 |
| | 2 | 3 | | | | | | 1 |
| | | | 4 | | 1 | | | 9 |
| 9 | | 5 | | | | 7 | | |
| | 8 | 1 | 5 | | 6 | | | |

Sudoku: Bersiv 74

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 8 | 2 | 5 | 3 | 4 | 9 | 7 | 6 | 1 |
| 9 | 1 | 3 | 8 | 6 | 7 | 2 | 4 | 5 |
| 6 | 7 | 4 | 5 | 1 | 2 | 8 | 9 | 3 |
| 5 | 3 | 1 | 6 | 9 | 8 | 4 | 7 | 2 |
| 7 | 8 | 2 | 4 | 3 | 5 | 9 | 1 | 6 |
| 4 | 6 | 9 | 2 | 7 | 1 | 3 | 5 | 8 |
| 1 | 4 | 6 | 7 | 2 | 3 | 5 | 8 | 9 |
| 3 | 5 | 7 | 9 | 8 | 6 | 1 | 2 | 4 |
| 2 | 9 | 8 | 1 | 5 | 4 | 6 | 3 | 7 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Me rûyê xwe reş kir:**
- Me tiştke şermê kir; şerm bû em bikin lê me kir.

**Nikare serê xwe rake:**
- Şermoker e.

**Patika xwe xwerand:**
- Ji ber ku nizaniya şerm kir; li ber xwe ket.

**Pişta stûyê xwe xwerand:**
- Şerm kir; li ber xwe ket.

**Rê kir toz:**
- Ji şerma baz da.

**Rûyê min nîne:**
- Ez şerm dikim.

**Rû li rû dikeve:**
- Tiştên baş bike da pişt re tu şerm nekî.

**Rûyê min li ber te reş e:**
- Dema yek gotineke şermê li cem mirovekî mezin dibêje, wisa dibêje.

**Rûyê xwe qayîm kir:**
- Şerma xwe avêt.

**Rûyê me reş kir:**
- Em hetikandin; em şermezar kirin; ji şerma êdî em nikarin serên xwe rakin.

**Rû ji me re nehişt:**
- Bi heman wateyê.

**Rûyê min nagire:**
- Ez şerm dikim; ez li ber xwe dikevim.

**Rûyê min li bin piyê te:**
- Rûyê min li ber te reş e; ez bi vê gotinê li ber xwe dikevim.
(Dema yek gotineke şermê dibêje hingê bi kar tîne)

**Rûyê min diêşe:**
- Ez li ber xwe dikevim; ez jê şerm dikim daxwaziyeke wisa bikim.

**Rû li me nema:**
- Em pir li ber xwe ketin; em hetikîn; em rezîl bûn.

**Rûyê min çû erdê:**
- Dema yek tişteke şermê dibêje, yan dike, yan jî xizmin wî tişteke wisa dikin vê biwêjê bi kar tîne.

**Rûyê min ket ber min/rûyê min ket erdê:**
- Min pir şerm kir; ez hetikîm; ez pir li ber xwe ketim.

**Serê min ket bin piyê min:**
- Bi heman wateyê.

**Ser milê xwe de nabe:**
- Li xwe nagire; şerm dike; xwe piçûk nake.

**Serê xwe xist nava çeqên xwe:**
- Pir şerm kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Divê em benda dewletê nemînin, bi xwe weke kirdeyên pêvajoyê tevbigerin'



Parlamentera Mêrdînê Berîtan Guneş Altin diyar kir ku ji destpêka pêvajoyê û heta niha di statuya Rêber Apo, rewşa wî ya jiyanî û xebatê de guhertinek çênebûye, ji bo wê diyarkirina statuya fermî û şertên azadiya fizîkî ji bo pêşveçûna pêvajoyê girîng e...**R-4**

## Kolonyalîzim û gelên di bin mêtîngeriyê de




Tevî pêşketinên girîng ên ku cîhanê di warê mafên mirovan û mafê çarenûsê yê gelan de bi dest xistiye jî, pirsgirêkên kolonyalîzim û serdestiyê bi awayên cûrbecûr li gelek deverên cîhanê berdewam dikin...**R-7**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1375 | 10-Gulan-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## Di nava şer û pevçûnan de; Kiryarên li ser jin



Herêmên Ereban di dehsalên borî de rastî gelek şer û pevçûnan hatiye û bûye weke qadeke şer di cîhanê de. Bandorên wan şer û pevçûnan ên neyînî di nav civakê de kûrtir dibin ku li hemû beşên wê dikin...**R-2**

## Di çanda kurdewarî de hunerên destên dayikan



Hunerên destên dayikan di çanda Kurdî de xwedî cihekî taybet û girîng in, ew ne tenê wekî pîşeyê ye, lê wekî parastina çand û kevneşopiyên dema berê tên dîtin.**R-9**

# ENTEGRASYON E YAN HELANDIN E ?!

Dewleteke ku li ser navendîbûneke mutleq û dûrxistina çandî were avakirin, aramiya rastîn çênake; pêşketinên heyî eşkere dikin ku hikumeta demkî ya Sûriyê, hişmendiya wê li ser bingehê bindestkirina herêmê û ji nû ve entegrekirina wê di nav hiyerarşiyeke navendî ya girtî de ye. Li şûna ku ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûriyê wekî modeleke ku dikare di ji nû ve avakirina welêt de piştî şer, were dîtin, ew wekî rewşeke demkî ku divê hêdî hêdî were jihevxistin û bikeve bin kontrolê, nêzîk dibin.**R-5**




## 'Ji bo aştî pêk were, me daxwazên xwe ji partiyên siyasî re anîn ziman'



Dayikên Aştiyê bi boneya Roja Dayikan û di çarçoveya 'Banga Aştî û Civaka Demokratîk' de hevdîtinên xwe yên bi partiyên siyasî re dest pê kirin û di van hevdîtinan de serlêdana MHP'ê, CHP'ê, Partiya Gelecek, AKP'ê û di dawiyê de bi Hevserokê Giştî yê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan re civiyan da ku serlêdan Girava Îmraliyê bikin.**R-3**



**Ziman, dayik, dadgeh û edalet**
İsyan Karadeniz R-2



**Hemwelatîbûn Şiyana Qebûlkirina Cihêrengiyan E!**
Idrîs Henan R-4



**Xweşbînî û aştî**
Hafiz Ahmet Turhalli R-7



**Keleha hişê dij-mêtinger**
Remezan Olçen R-9

# Di nava şer û pevçûnan de; Kiryarên li ser jin

Esma Miştefa

Herêmên Ereban di dehsalên borî de rastî gelek şer û pevçûnan hatiye û bûye weke qadeke şer di cîhanê de. Bandorên wan şer û pevçûnan ên neyînî di nav civakê de kûrtir dibin ku li hemû beşên wê dikin, di nava van şer û pevçûnan de jin koma herî zêde bandor lê dibe ye ku ji tundûtûjî, cudakarî û xizaniyê dikişîne.

Raporek ji aliyê Sinduqa Neteweyên Yekbûyî ya Nifûsê UNFPA nîşan dide ku ji %30 zêdetir jinên li herêmên şer bi hin cureyên şîdeta cinsî re rû bi rû ne, ev yek jî balê dikişîne ser asta êşa ku jin di van şert û mercên dijwar de dikişînin. Li gorî Rêxistina Efûya Navneteweyî, jin û keç di şerên çekdarî de wekî çekek şer têne bikar anîn, û ev yek dibe sedema zêdebûna destdirêjî û êrîşan.

Mînak, li Sûriyê gelek rêxistinên nehikumî rewşên destdirêjiya cinsî ya sîstematîk li dijî jinan li deverên di bin kontrola leşkerî de, belge kirine. Rêbazên tecawizê di şerê Sûdanê de jî wekî yek ji diyardeyên ku zayenda jinê tê bikaranîn derdikeve pêş ku tê de rûmeta jinan di çarçoveya krîzan de tê binpêkirin.

Di vê raporê de em ê balê bikşînin ser kiryarên ku jin di herêmên tê de şer û pevçûnên çekdarî ji salan ve tên jiyankirin her wiha yên di sala 2026'an hatine belavkirin, bilêv bikin. Bi taybet ji wan welatan Îran, Yemen, Sûdan, Filistîn, û Sûriye. Li gorî lêkolînên ku me kirine û bîlanç oyên ku me karîn berhevkiribana, me rapor amade kiriye.

Îran/ Di nav qurbaniyên ku hatine destnîşankirin de 286 jin û 172 zarok û ciwan ji destpêka xwepêşandanên Îran û Rojhilatê Kuridstanê ya serhildana 2026'an de hatine kuştin.

Li gorî îtîrafên ji aliyê rêjîmê bi xwe, çend hezar kes hatine kuştin. Rêxistina Mucahîdên Gel a Îranê (PMOI/MEK) radigihîne ku zêdetirî 50 hezar kes hatine girtin. Her wiha heman rêxistinê navên 2 hezar û 572 kesên ku di dema serdegirtin û çewisandina rejîmê ya li dijî serhildana Çileya 2016'an de jiyana xwe ji dest dane, belge kirin û weşandin. Di nav qurbaniyên ku hatine destnîşankirin de 286 jin û 172 zarok û ciwan hene.

Di vê çarçoveyê de, Komîteya Jinan a Meclisa Berxwedana Neteweyî ya Îranê lîsteya jin û keçên ku di serhildana Çileya 2026'an a li Îranê de di têkoşîna azadî û wekheviyê de jiyana xwe ji dest dane, belav kir.

Yemen/ Raportek mafên mirovan ku di 9'ê Adara 2026'an de derketiye, li Yemenê zêdetirî 5 hezar 834 binpêkirinên Husîyan li dijî jinan belge dike. Binpêkirinên ku









ji aliyê milîsên terorîst ên Hûsî ve li dijî jinên Yemenî têne kirin, di nav pirsgirêkên herî bi êş de ne. Ji dema ku milîsên Hûsî parêzgehên Yemenê kontrol kirin, jinên Yemenî rasterast bûne hedefa cûrbecûr îstîsmarên tundûtûjiyê û bi şert û mercên şer ên dijwar re rû bi rû mane.

Di vê çarçoveyê de û bi Roja Jinan a Cîhanî re, raporek mafên mirovan a vê dawiyê hejmar û tawanên ku hin binpêkirinên ku jinên Yemenî di salên dawî de rastî wan hatine belge dikin eşkere kir.

Tora Maf û Azadiyên Yemenê di raporekê de ku bi boneya Roja Jinan a Cîhanî hatiye weşandin, zêdetirî 5 hezar 834 binpêkirinên ku ji aliyê milîsên Hûsî ve li dijî jinan li Yemenê di navbera 1'ê Çileya 2017'an û dawiya sala 2025'an de li panzdeh parêzgehên Yemenê hatine kirin, belge kir.

Li gorî daneyên raporê, tîma meydanî hezar û 479 bûyerên kuştina jinan, digel 3 hezar û 398 birîndarbûnên ku ji ber top û roketan, teqîna mayîn û teqemeniyên destçêkirî, û her wiha gulebarana sekvanan li gelek deveran çêbûne, belge kirine.

Di raporê de her wiha 547 rewşên revandin, windakirina bi zorê û îşkenceyê hatine tomar kirin, di heman demê de 176 rewşên leşkerkirina bi zorê ya jin û keçan, di nav de xwendekarên jin jî, hatine belgekirin.

Di raporê de her wiha hate destnîşankirin ku 314 jin bi guleyên sekvanî, 317 jin bi guleyên rasterast, û 211 birîndarên din jî ji ber êrîşên cinsî yên weke kêrkirinê, an jî lêdana ji aliyê wesayîtên leşkerî ve birîndar bûne.

Ev hejmar, sûc û binpêkirinên li dijî jinên Yemenî ku bi destê milîsên Hûsî pêk hatine, nîşan didin. Her wiha wêneyekî tirsnak ê asta êşa ku jinên li Yemenê di bin kontrola milîsan de pê re rû bi rû dimînin.

Sûdan/ Rewşa Sûdanê ya ku îro tê re derbas dibe, xeteriyên gelek mezin re hêştiye, û jiyana rojane ya gel xistiye nava gefên tunebûna av û xwerinê. Her wiha tunebûna lênêrîna bijîşkî, tenduristî him di aliyê fîzîkî û pêskolojîk de, êşa gel zêdetir kiriye.

### Rapora neteweyên yekbûyî ya 11'ê Mijdara 2025'an derbarê rewşa ji ku di Sûdanê de tê jiyankirin

Rêxistina Jinan a Neteweyên Yekbûyî (UN Women) raporek weşand ku balê dikişîne ser aliyên zayendî, mirovî yên bêewlehiyê li Sûdanê. Anna Motavati, rêvebira herêmî ya Neteweyên Yekbûyî ya Jinan li Rojhilat û Başûrê Afrîkayê, piştî weşandina raporê li Cenevreyê bi rojnamevanan re axivî û got ku her roj "cîhan gavavêtina li ser Sûdanê dereng dixe, jineke din di bin bombebaranê de tê dunyayê, an zarokê xwe ji birçîbûnê vedişêre, an jî bê edalet, winda dibe."

Wê anye ziman ku jinan ragihandine ku li El Faşer, ji birçîbûn, koçberî, tecawiz û bombebaranê êş kişandine, li wir jinên ducanî piştî ku nexweşxaneyên dayiktiyê yên dawîn hatin talankirin û wêrankirin, li kolanan zarok anîn dinyayê."

Her wiha li ser rewşa bi xeter ya jinan di aliyê jiyanê de wiha gotibû: "Tiştê ku jin ji me re dibêjin ev e ku di rêwîtiya wan a dijwar de, her gavek ku wan ji bo anîna avê, berhevkirina daran ji bo agir, an jî sekinandina li rêzê ji bo xwarinê diavêtin, xeteriyeke mezin a şîdeta cinsî dihewîne."

Mutafati hişyarî da ku laşên jinan "li Sûdanê bûne cihê sûc", û tekez kir ku "êdî cihên ewle nînin" ku jin bikaribin parastinê an lênêrîna bingehîn a psîkolojîk û civakî bibînin.

Her wiha Anna Motavati di Nîsana 2026'an de ev yek anî ziman, ""Bi hemdemiya ku em dikevin sala çaremîn a şerê li Sûdanê, girîng e ku em zelal bikin ka ev ji bo jin û keçan tê çi wateyê. Ji ber ku di dawiyê de, ev şerekî li dijî wan tê meşandin.

Plana şerê Sûdanê tijî kuştinên berbelav, koçberkirina girseyî û, ya herî girîng, karanîna tundûtûjiya cinsî bûye. Ev wehşiyet ji ber dorpêçkirin û bêîstîqrariya domdar, zêdetir bûne. Her wiha ji ber rewşa berbelav a ku tê jiyankirin, bêcezatiyeke pir mezin tê kirin.

Îsal zêdetirî 17 milyon jin û keç hewcedarê alîkariya mirovî ne. Zêdetirî 4 milyon û 300 hezar jin û keç di nav welêt de bê cih û war mane."

Filistîn/Rêxistina Efûya Navneteweyî di 8'ê Adara 2026'an got ku tiştên ku jin û keçên Filistînî li Xezeyê rastî wan tên, yek ji awayên herî giran ên cudakarî û tundûtûjiyê li dijî jinan e. Ev yek êrîşên berdewam ên Israîlê û wêrankirina berfireh a ku jiyana jinan talankiriye dide diyarkirin. Ev binpêkirin bi taybet di aliyê tenduristî de bandoreke mezin kiriye û bi taybet li ser rewşa zayînê.

### Bi giştî ji destpêkirina şerê Israyîlê li ser Filistînê ev bîlanco hatin berhevkirin:

Kûştin û birîndarî: Hejmarên ku hatine belgekirin ji Cotmeha sala 2023'an heyanî sala 2025'an, zêdetirî 38 hezar jin hatine kuştin ku di şerê Israyîl li ser Filistînê, rojane nêzî 47 jin û keçik dihatin qetilkirin. Ev kuştin heta di dema ragihandina agirbestan de jî dihatin pêkanîn. Her wiha zêdetirî 11 hezar jin di nava van şeran de birîndar bûne.

Girtin: Raporek ji aliyê rêxistinên mafên girtiyan ve hatiye weşandin eşkere kir ku di sala 2025'an de li Difa Rojava kampanyayên girtinê yên berfireh û lêpirsînê meydanî hatine kirin. Di sala 2025'an de zêdetirî 7 hezar girtin hatine belgekirin, 200 ji wan jin in.

Her wiha li gorî ku hatiye tesbêtkirin di nava van şer û pevşûnan de ku herî zêde jin dibin qurbanî û ziyanê dibînin di aliyê koçberî û terkandina mal û milkên xwe de, nêzî milyonek jinan koçber bûne û bi qasî ji sedî 60 terka malîn xwe kirine.

Sûriye/ Sûriye ji zêdetirî 15 salan e tê de şer û pevçûnên giran tên rûdan, ger em bîlancoyên van salan kom bikin bi milyonan jin hatine qetilkirin, birîndarkirin, girtin û revandin, ji bilî koçberiyên bi girseyî ber bi welatên jiyanê ve herikîne. Bi taybet bi hatine hikumeta demkî ya Sûriyê re, bi sedan jinên Elewî, durzi, kurdî û hwd hatin kuştin, girtin û revandin. Li gorî bîralcoyên sala 2026'an ku ji aliyê Jêdera Sûrî ya Mafê Mirovan ve hatine tesbîtkirin, di heyva Çileyê de 33 jin û 39 zarok, di Sibatê de 15 jin û 4 zarok, Adar 4 jin û di Nîsanê de 3 zarok hatine kuştin.

Akademiya Jineolojî

## Ziman, dayik, dadgeh û edalet

İsyan Karadeniz

Di pêşketina ziman de wek avaker û xolikkar dayik; xwedî rolekî mezin e. Heta niha jî di hemû zimanan de dema zimanê zikmakî tê gotin dibejîn zimanê dayik an jî dayik tê bîra mirov. Ji ber ku dayik mamoșteya jiyanê ye. Yê ku rêvedibe, yê ku rêxiștin dike û yê ku rekûpek dike bi hemu awayan dayik e an jî dayîk; jiyanê diherikine. Bi vê şewazê em dikarin dibejin ku zimanê dayik an jî mamoște ya deștpêk Dayik, nasnameya civakê bi xwe ye. Xolikkariya dayikê ku jiyanê dixemline, dibe hebun û pênaseya civakê. Ji ber vê israrkirina di hebun û nasnamêya xwe; dibe israra di xwebunê xwe. Xwedî derketina nirxên xwe yên civakê; wek ziman, çand, ax û welat û her wiha pivanên xwe yên adalet û hêza xwe ya siyasi û politik așta azadbunê diyar dike. Ev sernav hemu jî li dora dayikê şekil girtiye. Ev dibe zimanê dayik, çanda dayik, ax û welatê dayik, dadgeh... etimolojiya van pêyvan heta naverokê jî temsila nirxên dayikê dike.

Niha di welatê me têkoşîna ku em dimeşinin yek jî li ser esasê bi zimanê xwe perwerde ditin û xwe ifade kirin e. Heger civakek bê ziman bimînî wekê ku tune ye, di bin pencê qirkirinê de dijî. Ev rașțiya ku em niha jiyan dikin û li dijî kiryaran tê dikoşin; wek kiryarê ku niha heyî politikayên tune kirina zimanê xwecihî ye.

Zimanê Kurdî ku zimanek kevnar a vê axê ye; wek welatê me Kurdiștan her tim qedexe re rû bi rû ye. Her tim êrişekî ser heye û wek zimanekî fermî nayê qebul kirin. Mirov dikarî di vê derbarê de minakek bide. Pir caran dewletan bi zimanê Kurdî axaftin qedexe kiriye. Ne tene li mekteban an jî saziyên dewletê. Heman demê li malê û di nava civakê xwe bi xwe de jî. Lê, gel bê çare nema ye û ji bo parașțina zimanê xwe navek cuda peyda kiriye û disa jî axiviye; gotiye zimanê şevê, mina zimanê çîvîkan...

Hewldana êrişên li ser heremê ku; neqebul kirina saziyên jin, YPJ, her wiha deșt avetina dadgehê û neqebul kirina zimanê Kurdî hemû di bingeha xwe de êrişê li ser jin dayik e ku dibe hebuna civakê. Rêber Apo giredanbuna jin û civakê bi van hevokan tîne ser ziman; ''așta azadiya jinê, așta azadiya civakê dide nişandan.'' Civakê ku jin bibe pêşeng, bibe rê û resmê civakê li vê derê xwe parașțin, xwebun- zimanê dayikê xwe ifade kirin û edaleta dadgehê dikarin werin behs kirin. Lê di nava civakê ku hebun û tunebuna jinê nexuyayê be li vê derê mirov dikarê bibejê ku ev civak bê parașțin e, nikarî bi xwe xwe biryarê biștine, nikarê bi zimanê xwe biaxive, bifikre, jiyan bike û xwe perwerde bike. Heta ku sazî û rêxiștinbuna xweser a jinan nebe, pêşketinekê zaniștî jî nayê bideșt xiștin.

Dayiktî ne tene buyerekê fizikî ye; heman demê fikrî, dirokî û zaniștî ye ku meyzekirina mirov dide diyar kirin. Xwedi derketina taybetmendiyên dayiktiyê xwedî derketina ziman, parașțina cewherî, sazî û dezgehên xwe yên bingehin e. Hafiza ya civakî her dem zindiye û tu hêz nikarê li pêşiyê bigre. Dema gel nerazibuna xwe da nişandan û bi çalak bu; dikarê çarxa pergalê bişkinî. Li vê derê tiştê ku pêwiște em di ferqê de bin ev e ku em jî dirokê tecrube derbixin, bi zanișt tevbigerin û giredanbuna dayik, civak, ziman, edalet û gellek taybetmeniyên ku bi hev re hatiye hunandin em di hişê xwe de her tim zindî bihêlin. Em ji bir nekin ku Rêbertî ji bo jinê dibejê jin; çavkaniya jiyanê ye, cewhera civakê ye. Ji bo na vê jî rișta ku jin li vê derê dileyzê û pêwiște bileyzê were zanin.



# Koriya Bakur û bernameya nukleerî

Koriya Bakur di seranserî deh salan de hewl daye ku bernameya nukleerî pêş bixe, ji hêzeke biçûk dest pê kir û bû hêzeke nukleerî ya herî mezin ku gefan li tevahî cîhanê dike.

Navenda Nûçeyan

Koriya Bakur yek ji neh dewletên xwedî çekên nûklerî ne, di heman demê de cîhan xistiye metrsiyeke mezin ji ber bernameya wê ya nûklerî û mûşekên balîstî. Koirya Bakur bi dehê salan hewildaye parastina pêşxistina bername û çekên nukleerî kiriye, da ku welatê xwe bike mezintrîn hêza nukleerî, tevî ku ambargoyên navdewletî û zextên Amerîkî li ser Byog Yang lê ew şiayan xwe ya leşkerî bi hêzeke mezin berdewam dike.

### Destpêk.. bernameyek sînorkirî bi piştgiriya Yekîtiya Soviyetê bû

Piştî bidawîbûna şerê Koriya di destpêka salên 50'î de, Koriya bû du dewlet. Bi piştgiriya Yekîtiya Soviyetê Koriya Bakur dest bi çêkirina bernameyeke nukleerî kir. Di destpêka salên 60'î de Yong Yang yekemîn reaktoreke biçûk bi kapîsîteya 2 mêgawat xebitand, piştre bi kapîsîteke ku gihaşt 4 paşê 8 mêgawat bi hevkariya pisporên Soviyet ew pêş xist. Herwiha asta dewlemendkirina sotemeniyê jî gihaşt astên bilind ku bi teorîkî dihêle ku ew di çêkirina çekên nukleerî de were bikar anîn. Di wê demê de jî, Koriya Bakur mencemên uranyoma xwezayî keşf kir û karîbû kargehên helberîna sotemeniya nukleerî ya herêmî ava bike, ev gav serxwebûneke mezin di bernameya nukleerî de dayê.

### Guhertina ber bi hilberîna plutonyûmê ve

Di salên 80'ê de dîzayînên reaktorên Birîtanî ket destê Koriya Bakur, ku bi uranyoma xwezayî û Girafêt dixebite. Tê payîn ku wê reaktorên xwe yên navxweyî li ser wan ava kiriye.

Di Çileya 1986'an de, bi kapasîteya nêzîkî 5 megawatt Koreya Bakur dest bi xebitandina yekem reaktorên xwe yên navxweyî li devera Yongbyon kir.

Her çend Byong Yang îdîa kiribû ku armanca wê helbrîna elektrîkê ye jî, lê ev cure reaktor ji bo hilberîna plutonyûma ku kapîsîteya wê bilind e, ji bo karanîna di çekên nukleerî de jî tê bikar anîn.

Paşê, Koreya Bakur dest bi avakirina tesîsan kir, ji bo ji nû ve hilberandina sotemeniya nukleerî bi armanca derxistina plutonyûmê, ku ev yek gumanên navneteweyî yên berfireh li ser xwezaya leşkerî ya bernameyê derxist holê.

### Aloziya lêpirsînê û vekişîna ji hevpeymaniya qedexekirina belavbûnê

Di sala 1992'an de, Koriya Bakur tevlî Ajansa Navneteweyî ya Enerjiya Atomî bû û li ser Peymana Qedexekirina Belavbûna Çekên Atomî (NPT) erê kir, herwiha hişt ku mûfetîşên saziyê serdana tesîsên wî yên nukleerî bike.

Lê piştî ku ajansê xwest ku cihên din ên ku guman dikir çalakiyên nukleerî yên veşartî lê çêdibe, lêgerîn bike, nakokî derketin holê, ev daxwaz ji aliyê Byong Yang ve hate redkirin, ji ber ku ew cihan wekî tesîsên leşkerî dihesiband. Piştre mijar ji Konseya Ewlekariyê ya NY re hate şandin. Koreya Bakur bi ragihandina niyeta xwe ya vekişîna ji Peymana Qedexekirina Belavbna Çekên Atomî di sala 1993'an de bersiv da.

Piştre Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê destwerdan kir û bi Koreya Bakur re danûstandinên dualî pêk anî, di encamê de lihevkirinek hat çêkirin ku vekişîna wê ji peymanê rawestîne û destûrê bide ku çalakiyên wê yên nukleerî lêkolîn bikin, bêyî ku vegere çalakiyên xwe yên berê di vî warî de. Di heman demê de Koreya Bakur xebata li reaktorê (Yongbyonê) domand.

Di bihara sala 1994'an de, krîza yekem di navbera Koreya Bakur û Ajansa Enerjiya Atomî ya Navneteweyî de li ser xebitandina reaktora wê ya nukleerî derket û ev yek bû sedem ku Serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Bill Clinton daxwaza cezayên aborî li dijî wê bike, di heman demê de Byong Yangê ew ceza wekî ragihandina şer bi nav kir.

Di Cotmeha 1994'an de, Serokê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê Jimmy Carter bi rêberê Koreya Bakur Kim Il-sung gihaşt peymanekê, ku tê de xebata reaktorên nukleerî yên Koreya Bakur hate cemidandin û destûr hate dayîn ku mufetîşên Ajansa Enerjiya Atomî ya Navneteweyî vegerin lêkolîn bikin, di berdêla wê de ku Dewletên Yekbûyî û hevkarên wê du reaktorên (ava sivik) çêbikin û salane 500 hezar ton sotemenî bidin Koreya Bakur, ji bilî garantiyên ku êrîşî wê nekin. Peyman bû alîkar ku bernameya nukleerî ya li ser bingeha plutonyûmê ji bo deh salan were cemidandin, lê ji ber tawanbarkirinên hevbeş ên nepabendbûnê nakokî berdewam kirin. Bi hatina rêveberiya George W. Bush di sala 2001'an de û zêdebûna pirsgirêka mûşekên Koreya Bakur, rageşiya di navbera Washington û Pyongyangê de ji nû ve derket holê.



### 2003 xala herî giring bû

Di sala 2003'an de, Koreya Bakur bi fermî vekişîna xwe ji Peymana Qedexekirina Belavbûna Çekên Atomî ragihand û mufetîşên ji Ajansa Enerjiya Atomî ya Navneteweyî derxist, bi vî awayî qonaxek nû ya pêşxistina bernameya xwe ya nukleerî dûrî her çavdêriya navneteweyî dest pê kir.

Reaktorê Yongbyonê ji nû ve da xebitandin û dest bi derxistina plutonyûmê ji sotemeniya xerckirî kir, di nav texmînên ku ew karîbû têra çêkirina çend bombeyên atomî hilberîne. Herwiha dest bi pêşxistina tesîsan ji bo dewlemendkirina uranyuma kir, bi vî awayî rêyek din ji bo hilberîna çekên nukleerî ji bilî plutonyûmê nîşan dide.

### Rewşa heyî

Li gorî lêkolînên ji navendên navneteweyî yên lêkolînan tê texmînkirin ku li gel Koriya Bakur 50 serikên nukleerî hene.

Di çarçoveya zêdebûna aloziyên jeopolîtîk û kêmbûna pergalên kontrolkirina çekan de, di 27'ê Nîsana 2026'an de Konferansa 11'emîn yê Qedexekirina Belavbûna Çekên Atomî destpê kir û tê payîn dê heya 22 Gulanê berdewam bike.

Di vê derbarê de Ajansa nûçeyan a dewleta Koreya Bakur KCNA ji nûnerê daîmî yê Byong Yangê li Neteweyên Yekbûyî, Kim Song, di daxuyaniyek fermî de raghand ku Dewletên Yekbûyî û hin welat bi bilindkirina mijara çekên nukleerî yên Koreya Bakur di 11'emîn Konferansa Nirxandinê ya Peymana Qedexekirina Çekên Nukleerî de ku li baregeha Neteweyên Yekbûyî tê lidarxistin, atmosferê xera dikin. Di heman demê de ajansê tekez kir ku Koriya Bakur nepabende bi her peymanekê girêdayî qedexekirina belavbûna çekên nukleerî.

### Peymana Qedexekirina Belavbûna Çekên Nukleerî

Peymana Qedexekirina Belavbûna Çekên Nukleerî (NPT), di sala 1970'an de ket meriyetê, ew kevirê bingehîn ê hewldanên navneteweyî ye ji bo pêşîgirtina li belavbûna çekên nukleerî. Peyman li ser sê stûnên sereke disekine: nebelavbûn, ku tê wateya sînordarkirina ketina dewletên nû nav "klûba nukleerî"; bêçekkirin, ku dewletên çekên nukleerî neçar dike ku cebilxaneyên xwe kêm bikin; û karanîna aştiyane ya enerjiya nukleerî, ku mafê dewletan garantî dike ku bernameyên nukleerî ji bo armancên sivîl di bin çavdêriya navneteweyî de pêşve bibin. Peyman berhema têgihîştinek di navbera Dewletên Yekbûyî û Yekîtiya Sovyetê de di dema Şerê Sar de bû, ku armanc dikir ku pêşbaziya çekên nukleerî kontrol bike û pêşî li berfirehbûna wê ya gerdûnî bigire.

### Navendeke lêkolînê li ser metirsiya zêdebûna pêşbaziyek nû ya çekên navokî hişyarî dide

Navendeke lêkolînê ya Swêdî ragihand ku sala borî li seranserî cîhanê zêdetirî 12 hezar serikên nukleerî hebûn, di heman demê de stoka nukleerî ya cîhanî bi berdewamî kêm dibe. Lêbelê, ew hişyar dide ku leza hilweşandina van serikên nukleerî bi hêdî dibe, herwiha belavbûna çekên nukleerî yên nû leztir dibe.

Peymangeha Lêkolînên Aştiyê ya Navneteweyî li Stockholmê di rapora xwe ya salane de eşkere kir ku neh welatên ku xwedî çekên atomî ne, heta Çileya 2025'an, bi texmînî 12 hezar û 241 serikên nukleerî li gel wan hene. Ev neh welat Rûsya, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, Çîn, Fransa, Brîtanya, Hindistan, Pakistan, Îsraîl û Koreya Bakur in.

Tê texmînkirin ku Rûsya xwediyê stoka herî mezin a 5 hezar û 459 e, piştre Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi 5 hezar û 177 e. Ev her du welat nêzîkî 90 ji sedî ji tevahiya stoka cîhanî di destê xwe de digirin.

Peymangeh texmîn dike ku Çîn xwediyê sêyemîn stoka herî mezin e ligel wê 600 serikên nukleerî hene û cebilxaneya wê ya nukleerî bi lez ji her welatekî din mezin dibe, bi qasî 100 serikên nukleerî yên zêde li gorî sala borî.

Li gorî peymangehê, Fransa ligel 290 serikên nukleerî û Brîtanya jî 225 serikên nukleerî hene. Ligel Îsraîl 90 serikên nukleerî hene, di heman demê de Koreya Bakur 50 serikên nukleerî hene.

Peymangeh dibêje ku di nîvê salên 1980'an de hejmara serikên nukleerî li cîhanê bi qasî 70 hezar bû. Lê ji ber hilwişandina wan ji hêla Rûsya û Dewletên Yekbûyî ve piştî Şerê Sar bû sedema kêmbûna salane ya giştî ya cebilxaneya nukleerî di cîhanê de.

peymangeh balê dikişîne ser bidawîbûna peymana kêmkirina çekên nukleerî ya di navbera Rûsya û Dewletên Yekbûyî de di Sibata vê sale de ku wekî Peymana Kêmkirina Çekên Stratejîk an jî New START tê naskirin.

Di raporê de hate destnîşan kirin ku bidawîbûna peymanê nîşana dawiya serdema kontrolkirina çekên nukleerî û destpêka serdema nû ya zêdebûna gefên nukleerî ye. Ew li ser zêdebûna metirsiya pêşbaziyek çekên nukleerî ya nû û zêdebûna hejmara çekên nukleerî hişyarî dide.

Herwiha lê zêde dike ku nebûna çarçoveyek ji bo bêçekkirina nukleerî dikare bandorê li Peymana Qedexekirina Belavbûna Çekên Nukleerî bike. Ev yek dê pêşketina di pêşîgirtina belavbûna çekên nukleerî li Rojhilata Navîn û bêçekkirina Nîvgirava Koreyê de dijwartir bike û dibe ku nîqaşên li ser îhtîmala pêşxistina çekên nukleerî li Japonya û Ukraynayê zûtir bibin.

# Tundiya li ser jin û civakê hovitiya hişmendiya pergala sermayedar e

**Leyla Amûdê**

Mirovahî di serdemeke wiha de jiyan dike ku, hew maye pergala desthilatdar mirovan bi keviran û beran bide kuştin; ewqasî tundiyê li ser civakan dide sepandin û di hişê wan de, şer û tundiyê dide çêkirin. Weke ku tê zanîn 30 hezar sale ku pergala mêrê desthilatdar û kujerê kastîk, li ser jin û di şexsê jinê de jî li ser civakê tund û tujiyê dide meşandin û ew, xistine nava pençên xwe yên hesinî de. Û wiha li wan kiriye ku hew dikarin xwe bilivînin û weke mirovê ku xencer, dinava pişta wan de be weke ku Buda gotiye. Rêberê gele Kurd Abdullah Ocalan jî vê ya piştrast dike û dibêje: Ew xencera ku dipişta civakê de jî pirsgirêka jinê ye û heyanî, ku pirsgirêka jinê neyê çareser kirin wê tu pirsgirêk jî neyê çareser kirin.

Lê wiha ji min ve diyar dibe ku hîna jî pirsgirêka jinê, nehatiye famkirin û heyanî ku ev pirsgirêka sereke û kor neyê çareser kirin wê tekez; pirsgirêkên din jî neyên çareser kirin û wiha biçe jî wê, mirovahî mehşerê jiyan bike. Tekez gerek were zanîn bêka pirsgirêkê jinê çiye û divê, çawa were çareser kirin? Dibe ku hinek werin û bibêjin ku pirsgirêkên jinê hene û weke, tewriyên giştî ew jî bibêjin jin xwedî pirsgirêke û li pêşiya pêşveçûna civakê bûye; kelem û kevirê astenê. Naxwe pêdivî nîne ku em qala pergala desthilatdar û mêrperest bikin, yan jî qet pêdivî nîne ku em qala pergala bavik salar bikin û wê demê; jî pêdivî heye ku em hemû berê çekên xwe bidin jinan û em wan bixin bin, lêpirsînê de û em hesabên dîrokî ji wan bixwazin.

Civaka mirovahî li ku wenda kiriye û wê li ku jî peyda bike, tekez pêdivî heye ku em pir baş li ser van mijaran biponijin û rastiya wê li kuye; jî peyda bikin û jêre çareseriyê jî bibinin. Çareserî jî tenê bi rêber, pêşeng, serok, zanyar û feylesufan çênabe ji ber ku gelek pêxember, serok û rêber derketin û cardin jî pirsgirêkên kor; çareser nebûn û niha jî gelek dem di ser pirsgirêkê re, derbas bûye û pir jî kevnar bûye. Lê pêdivî heye ku em li pêşeng, Rêber Abdullah Ocalan, guhdarî bikin û peyam û perspektîfên wî; pir baş fambikin, bibêjin û pêkbînin (Fikir, Zikir û Çalakî) û pêdivî heye ku her kes barê xwe; rake û deste xwe bixe bin kevir de. Em hemû jî dizanin lê ger ku em li xwe mukur werin û rexnedayîna, xwe bidin û em bibêjin em jî hene û em livirin.

Ji xwe heyanî niha kêmasiya me ya bingehîn jî ev bûye ku, em hemû barê xwe davêjin ser milê Rêber Apo. Lê dem hatiye ku em her yek barê xwe rakin û çavê, xwe li ser heqîqetê vekin û em rewşa şîkayet û gazincan; berdin û berê tîra dijwar bidin xwe û li xwe mukur werin, tekez pêdivî pê heye ku em ji xwe pirs bikin û bibêjin: Ez li ku vê pirsgirêkê me û rewşa min çiye û herî zede jî pêdivî, heye ku mêr ji xwe pirs bikin û bibêjin ger ku pirsgirêk ya jinê ye çima heyanî; niha min çareser nekiriye û dibe ku bersiv jî wiha be! Ez tenê kesekim qey ez dikarim ji bo çreseriyê çibikim, her çiqasî ez dibinim jî lê destê min kurte û rewşa civakê pir xerabe; wê çaxê pêdivî heye ku mirov wiha bersiv bide û bibêje: Ger ku ti pirsgirêkê dibine û çareseriya wê jî dizane naxwe, çima ti ji xwe de destpê nake û çareser nake?

Çima ti her li benda hineka ye ku werin ji tere, çareser bike ma ewqasî ti ji xwe bêbawere û ewqasî jî bêçareye? Pirsgirêk hate famkirin û me hişmendiya mêrê kastîk û qatil jî naskir û famjî kirdizane û ti pir baş jî dibine naxwe ti dikare çareseriyê, jî pêkbîne û ti xwe dibine jî gerek em ji xwe dibe ku civakê, gelek qal û qîl hene û têkoşîna li hemberî tundiyê jî li seran serî; dîrokê her berdewam kiriye û hîna jî ew berxwedan û têkoşîn, xwe berdewam dike. dikelê mixabin, heya niha jî ti çareserî, jê re ne hatiye peyda kirin. Ger ku lêgerîna pirsgirêkê hatibe kirin jî lawaz maye û ti guhertin bi xwe re der ne xistiye holê, carnan jî bi dest werdana li mijarê jî tevlihevi-yek hîn mezintir bi encam kiriye û pêşiya çareseriya rast jî girtiye. Bêguman lawazî û şaştî wê her hebin lê nayê wê wateyê ku, mirov xwe dinava wan de ne û her ji wan bireve; ji xwe her çiqasî mirov bireve jî xelasî nîne û xencer, jî carekê hatiye çikandin û birîn jî gelekî kûr û zingiriye. Ev jî têye wê wateyê ku, pirsgirêk komiye (Komînal-Civakîye) û pêdivî jî heye, ku hemû civak hêza xwe bike yek û pileya têkoşîn xwe jî; bilind bike. Civaka mirovahî dibin êş, azer, xizanî, tundî û barê şeran de, jiyan dike û wiha li wan hatiye ku hew debar dikin. Gerek roj beriya rojê pirsgirêkên wan werin çareser kirin, lê pêdivî heye ku em di serî de xencera pişta civakê derxînin; ew jî pirsgirêkên jin û azadiyê çareser bikin ji xwe hemû pirsgirêk komîne.

Pirsgirêkên civakê dinava hevde çareser bibin, lê tekez pêdivî ya lezgîn bi guhertina hişmendî heye! Ew jî hişmendiya mêrê serwer û qatilê kastîke û pêdivî heye, ku hemû mêr xwe lêpirsîn bikin û bibêjin ez li kudevera vê; hişmendiyê me û çawa gerek ez xwe biguherim û ev ji bo jinan jî derbasdare, pêdivî heye ku ew jî pirseke wiha ji xwe bikin û bibêjin ez, li ku hişmendiya jinên kilasîkim û çawa ezê xwe biguherim? Ji xwe Rêber Apo her tişt gotiye û weke ku ta bi derziyê, vekiriye û gotiye: Tenê hun têkoşîn bikin û ew ji pêdivî heye ku her yek ji xwe de destpê bike û ev kilîta serkeftinê ye.

# Entegrasyon an Stratejiyeke Şikandina Îradeyê?

**Botan Amed**

Di qonaxek dîrokî de ku Rojhilata Navîn ji nû ve tê şekildan, danûstandinên entegrasyonê li Rojava nikarin tenê wekî rêkeftinek îdarî an pêvajoyek adaptasyona teknîkî werin hesibandin. Ev pêvajo xalek werçerxê ya stratejîk e ku dê rasterast pêşeroja nasnameya civakî, îradeya siyasî û destkeftiyên ku di salan de hatine bidestxistin diyar bike. Danûstandin, ku di demên dawî de lez bûne, bi hevsengiyên leşkerî û siyasî yên li ser erdê ve girêdayî pêşve diçin, ku naveroka têgeha “entegrasyonê” bi xwe nakok dike. Wisa dixuye ku tiştê ku li vir di xetereyê de ye ne bingehek ji bo lihevhatinê di navbera wekhevan de ye, lê belê ferzkirina yekalî ya sîstemekê ye. Modela entegrasyonê ya ku ji hêla nêzîkatiya navendî ya Şamê ve hatî pêşxistin kêmtir wekî lêgerînek klasîk a çareseriyê û bêtir wekî stratejiyek ji bo damezrandina hêdî hêdî ya hegemonyayê û hilweşandina avahiya xweser a heyî xuya dike. Di vê modelê de, entegrasyon ne bi rêya naskirina hevbeş û jiyana hevbeş, lê bi rêya navendîkirin û berfirehkirina mekanîzmayên kontrolê ve tê şekildan. Geşedanên li ser erdê jî vê nêzîkatiyê piştrast dikin. Danûstandin, ku bi zexta leşkerî re paralel dimeşin, pir caran wêneyek pêşkêş dikin ku danûstandin û zordarî bi hev ve girêdayî ne. Ev yek nakokiyeke bingehîn di xwezaya pêvajoyê de eşkere dike: Gelo pêşerojeke hevpar tê avakirin, an jî pergala civakî ya heyî hêdî hêdî tê hilweşandin? Di vê nuqteyê de, yek ji hêmanên herî berbiçav ên nêzîkatiya entegrasyonê ya Şamê stratejiya wê ya afirandina pêşbaziya navxweyî û parçebûnê ye li şûna pevçûna rasterast. Afirandina nebaweriyê di navbera avahiyên herêmî de, girêdana saziyan bi avahiyên navendî ve, û hewldana çêkirina hevsengiyek parçebûyî li şûna yekîtiya civakî stûnên bingehîn ên vê stratejiyê ne. Ev rêbaz xwedî potansiyela afirandina bandorek kûrtir ji destwerdanên leşkerî yên klasîk e. Ji ber ku li vir, hedef ne tenê deverên erdnîgarî ne; ew di heman demê de hişmendiya civakî, rêxistin û îradeya kolektîf e. Ji ber vê yekê, pêvajoya entegrasyonê ne tenê wekî mekanîzmayek zextê ya derveyî, lê di heman demê de wekî destwerdanek pir-qatî ya ku armanc dike hilweşîna navxweyî xuya dike. Paradîgmaya rizgariya jinan û avahiya civakî ya pirzimanî, ku di nav taybetmendiyên herî cihêreng ên Rojava de ne, wekî deverên herî di xetereyê de di vê pêvajoyê de derdikevin pêş. Marjînalîzekirina sîstematîk a temsîliyeta wekhev a jinan di warên siyasî û civakî de û rola navendî ya zimanê Kurdî di jiyana giştî û perwerdehiyê de di nîqaşên entegrasyonê de veguherînek cidî nîşan dide. Ev rewş pir caran ne bi qedexeyên eşkere, lê bi rêya nedîtin, bêbandorkirin û marjînalîzekirinê pêş dikeve. Bi vî awayî, bêyî afirandina pevçûnek rasterast, armanc valakirina destkeftiyan û di dawiyê de bêfonksiyonkirina wan e. Lêbelê, ev hêman ne tenê mafên çandî ne, lê di heman demê de bingeha pergalek civakî ne. Geşedanên li ser erdê bi zelalî nîşan didin ka ev pêvajo çiqas nazik e. Rastiya ku tevî agirbest û peymanên entegrasyonê pevçûn bi tevahî bi dawî nebûne, krîza baweriyê ya kûrtir di navbera aliyan de, û astengiyên dubare di danûstandinan de nîşan didin ku pêvajo hîn jî ji hilberandina çareseriyek mayînde dûr e. Ev wêne eşkere dike ku entegrasyon, di vê qonaxê de, kêmtir bûye modelek çareseriyê û bêtir bûye qadeke şer ku hêzên cûda hewl didin pozîsyonên xwe xurt bikin . Di pêvajoyek wusa de, hêmana herî bingehîn hişmendiya civakî û îradeya parastina van destkeftiyan e. Ezmûnên dîrokî nîşan didin ku gelek destkeftiyên civakî ne bi êrîşên rasterast, lê bi pêvajoyên ku bi rêya têgehên wekî “lihevkirin”, “normalîzekirin” an “entegrasyon” têne meşandin, hatine hilweşandin. Ji ber vê yekê, îro pirsgirêka herî krîtîk ev e ku destkeftiyên ku hatine bidestxistin divê ne tenê wekî rêziknameyên îdarî werin dîtin, lê wekî hêmanên bingehîn ên hebûna civakî werin parastin. Pirsgirêkên wekî azadiya jinan, ziman û mafên çandî pir girîng in ku bibin mijara her danûstandinekê. Ji ber vê yekê, danûstandinên entegrasyonê li Rojava ji nîqaşek li ser modelek rêveberiyê bêtir in; ew ceribandinek hebûnî ya pêşeroja pergalê temsîl dikin. Pirsa gelo polîtîkayên ku di bin navê entegrasyonê de têne meşandin dê jiyana hevbeş xurt bikin an jî avahiya heyî xera bikin hîn bi zelalî nehatiye bersivandin. Lêbelê, tiştek eşkere ye: bêyî hişmendiya civakî, rêxistin û îradeya parastina van destkeftiyan, tu destkeftî nikare mayînde be. Ji ber vê yekê, rêça pêvajoyê ne tenê bi hevsengiya hêzê li ser erdê, lê di heman demê de bi rêjeya parastina civakê nirxên xwe jî ve girêdayî ye.



# ‘Ji bo aştî pêk were, me daxwazên xwe ji partiyên siyasî re anîn ziman’

Dayikên Aştiyê bi boneya Roja Dayikan û di çarçoveya ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ de hevdîtinên xwe yên bi partiyên siyasî re dest pê kirin û di van hevdîtinan de serlêdana MHP'ê, CHP'ê, Partiya Gelecek, AKP'ê û di dawiyê de bi Hevserokê Giştî yê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan re civiyan da ku serlêdan Girava Îmraliyê bikin.

**Navenda Nûçeyan**

Dayikên Aştiyê, tevgereke civakî û aştiyane ya girîng e li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê ku piranî ji dayikên kesên di şer de jiyana xwe ji dest dane û Gerîlayên Azadiyê pêk tê. Ew ji salên 1990’î ve ji bo dawîanîna li şer, pêkanîna aştiyê, çareserkirina pirsgirêka kurd bi rêyên demokratîk û rawestandina xwînrijandinê têdikoşin. Di gelek çalakiyên rûniştinê, meş û daxuyaniyan de her wiha di rêveçûna siyasî de jî cih digir.
Dayikên aştiyê li çarperçeyên Kurdistanê û li Ewropayê hene. Bi taybet di pêvajoya dawiyê ya ‘Banga Aştî û Civaka Demikratîk’ her dem li ser piyan, li qadan û di nava çalakiyan de bûn. Her wiha di guhertina dengeyên siyasî, dîplomasî û civakî de xwedî roleke sereke bûn. Li hember tu partiyê ya dewletê tirsa wan nîne û armanca wan a sereke di vê pêvajoyê de ku pêvajoya aştiyê bi ser bikeve û xwîn nerije. Her wiha ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Abdullah Ocalan her tim di nava hewildanan de ne. Ji bo vê yekê Meclisa Dayikên Aştiyê li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê dest bi serdanên xwe yên dîplomasî ji bo partiyê siyasî kirin. Ev serlêdan bi bi boneya Roja Dayikan, Pêvajoya Aştî û civaka Demokratîk her wiha ji bo ziyaretkirina Rêber Abdullah Ocalan li girava Îmraliyê pêk hat. Rêze serlêdan ji bo hemû partiyên li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê kirin, her wiha di dawiya selêdanan de bi daxuyaniyekê weke encama van serlêdanan bi dawî kirin.



Şandeya Meclisa Dayikên Aştiyê ji Behiye Yalçin, Afîfe Kartal û Muzeyyen Butun pêk tê. Berdevka DEM Partiyê Ayşegul Dogan û parlamentera DEM Partiyê ya Amedê Adalet Kaya, di çerçoveya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de serdana partiyên siyasî kirin.

**Serdana MHP’ê**

Di 7’ê Gulanê de, Dayikên Aştiyê bi boneya Roja Dayikan hevdîtinên xwe yên bi partiyên siyasî yên li Meclirê re dan destpêkirin. Şandeya Dayikên Aştiyê, di çaçroveya serdanê de hevdîtin bi Serokwekîlên Koma MHP’ê Fîlîz Kiliçê û Erkan Akçay re kirin. Di hevdîtinê de dê li ser “Pêvajoya Aştî û Civak Demokratîk” nîqaş bên kirin.

**Serdana ji bo CHP’ê**

Dayikên Aştiyê di 8’ê Gulanê de, çûn serdana Navenda Giştî ya CHP’ê. Dayikan, bi Serokê Giştî yê CHP’ê Ozgur Ozel re hevdîtin kir. Di hevdîtinê de dayikan hêviya xwe ya ji aştî, diyaloga civakî û pêvajoyê û daxwazên xwe anîn ziman. Dayikên Aştiyê, di dema hevdîtinê de laçikên spî diyarî şandeya CHP’ê kir.
Di şandeya Dayikên Aştiyê de Behiye Yalçin, Afîfe Kartal û Muzeyyen Butunê cih girt. Her wiha Berdevka DEM Partiyê Ayşegul Dogan û Wekîla Amedê Adalet Kaya jî bi şandeyê re çûn serdanê. Di şandeya CHP’ê de jî Serokê Giştî Ozgur Ozel, Cîgira Serokê Giştî ya ji Polîtîkayên Hiqûqê Berpirsyar Gokçe Gokçen û endama Koordînasyona Ofîsa Namzetiya Serokkomariyê Emîne Uçakê hebûn.

**Serdana ji bo Partiya Gelecek**

Di çerçoveya serdanan de, Şandeya Dayikên Aştiyê di heman rojê de serdana Partiya Gelecekê kir. Serdan li Navenda Giştî ya Partiya Gelecekê pêk hat. Şandeya dayikan li gel Serokê Giştî Ahmet Davutoglû civiya. Cîgirên Serokê Giştî yên Partiya Gelecekê Halîme Polat, Burçak Başbug, Midura Nivîsgeha Taybet Esra Şahîn û Şewirmenda Polîtîkayên Dervê Sevînç Ozcan jî di hevdîtinê de amade bûn. Dayikên Aştiyê li vir jî Laçika Spî diyarî Davuoglû kir.



**Serdana ji bo AKP’ê**

Serdana Dayîkên Aştiyê li gel AKP’ê bi dawî bû. Heyeta Dayikên Aştiyê ji Behiye Yalçin, Afîfe Kartal û Muzeyyen Butun pêk tê. Berdevka DEM Partiyê Ayşegul Dogan û parlamentera DEM Partiyê ya Amedê Adalet Kaya jî bi Heyeta Dayikan re tevlî serdanan bûbûn. Heyeta Dayikên Aştiyê piştî serdana partiyên din li Meclisê serdana Koma AKP’ê kir.
Şandeya Dayîkên Aştiyê di serdanê de li gel Serokê Koma AKP’ê Abdullah Guler, Serokwekîlê Grûba AKP’ê Abdulhamît Gul, parlamenterê Rihayê yê AKP’ê Cevahîr Asuman Yazmaci û parlamentera Stenbolê ya AKP’ê Şengul Karsli re rûniştin.

**Serdana Hevserokê Giştî yê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan**

Heyetek ji Meclisa Dayikên Aştiyê di çarçoveya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de bi Hevserokê Giştî yê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan re hevdîtin pêk anîn.

Heyeteke Meclisa Dayikên Aştiyê di çarçoveya pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de bi boneya Roja Dayikan serdana partiyên siyasî kirin. Heyeta ji Dayikên Aştiyê Behiye Yalçin, Afîfe Kartal û Muzeyyen Butun pêkhatî, bi Berdevka DEM Partiyê Ayşegul Dogan û Parlamentera DEM Partiyê Adalet Kaya re serdana partiyên siyasî kirin. Heyeta Dayikên Aştiyê bi Hevserokê Giştî yê DEM Partiyê Tuncer Bakirhan re di 8’ê Gulanê de hevdîtin pêk anîn. Hevdîtin nêzî seatekê dom kir. Dayikan laçika spî diyarî Tuncer Bakirhan kirin.

**Selêdana Wezareta Dadê ji bo Îmraliyê û daxuyaniya dawî**

Di 8’ê Gulanê de, Heyeta Meclisa Dayikên Aştiyê piştî serdana partiyên siyasî ji bo çûyina Girava Îmraliyê hevdîtina bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re serî li Wezareta Dadê dan.
Dayikan piştî serlêdanê li ber wezaretê daxuyanî dan. Dayika Aştiyê Muzeyen Butunö bi lêv kir ku ew ji bo bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re hevdîtinê bikin serî li wezaretê dan û wiha got: “Me li vir bi partiyên siyasî re hevdîtin pêkanî. Em ji aliyê hemû partiyan ve jî baş hatin pêşwazîkirin. Ji bo pêvajo encam bigire û aştî pêk were êdî dilê dayikan neşewite me daxwazên xwe ji partiyên siyasî re anîn ziman. Daxwaza me ew e ku em bi birêz Abdullah Ocalan, birêz Bahçelî û birêz Serokkomar Erdogan re hevdîtin bikin. Bi mabesta Roja Dayikan em dixwazin hevdîtina me ya bi birêz Ocalan re bê qebûlkirin, derî vebin û hemû kes bikarin hevdîtinê bikin. Ji bo birêz Abdullah Ocalan bikaribe pêvajoyê pêşvebibe divê şert û mercên birêz Abdullah Ocalan bên başkirin. Daxwaza me ew e ku aştî pêk were û em di welatekî azad û wekhev de bi hev re bijîn.”

# ‘Divê em benda dewletê nemînin, bi xwe weke kirdeyên pêvajoyê tevbigerin’

Parlamentera Mêrdînê Berîtan Guneş Altin diyar kir ku ji destpêka pêvajoyê û heta niha di statuya Rêber Apo, rewşa wî ya jiyanî û xebatê de guhertinek çênebûye, ji bo wê diyarkirina statuya fermî û şertên azadiya fizîkî ji bo pêşveçûna pêvajoyê girîng e. Dewleta Tirk tu carî bê zext, nabe demokratîk, gavên şênber jî navêje û ji bo demokrasiyê zagonan çênake. Divê ew bendewariyê ji dewletê nekin, bi xwe wek kirdeyên vê pêvajoyê tevbigerin.

**Ronahî Sadûn**

Derbarê pêşveçûna pêvajoya Aştî û Civaka Demokatîk, herwiha nêzîkatiya dewleta Tirk ji pêvajoyê re, Parlamentera Mêrdînê Berîtan Guneş Altin bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Bi destpêkirina pêvajoyê heta niha ev cara duyemîne ku demeke dirêje hevdîtin bi Rêber Apo re nayê kirin, sedem çi ye ku hevdîtin pêk nayên, hûn dikarin girêdana wê bi pêvajoyê re bikin?**

Ji gava ku pêvajo dest pê kir heta roja îro, di kesayeta Rêber Apo de, me tevahî gelê Kurd behsa tecrîdeke giran dikir. Ev tecrîd caran wek rewşeke bê danûstandin, bê hevdîtin û tu hewldanek nehatina deng ji Rêber Apo ve, xwe didomand. Li aliyekî din jî, li ser gelê Kurd polîtîkayên ku dihatin meşandin, ev tecrîd kurtir dikir. Her çendî, piştî ku pêvajo dest pê kir, hevdîtin bi Rêber Apo re çêbûn, me dîsa behsa tecrîdê dikir û me digot: “Tecrîd hîn bi temamî nehatiye şikandin. Belê ji Rêber Apo peyam tên û hevdîtin çêdibin, lê tecrîd hîn bi dawî nebûye. Ji ber guhertin di rewşa Rêber Apo de çênebû û avahiya ku li derveyî girtîgeha Îmralî hatiye avakirin jî ne zelal e; Ev avahî çi ye, çawa ye, bi çi rengî ye û statuya wê çi ye?” Ji xwe Rêber Apo jî di gelek hevdîtinên xwe de behsa statuya xwe û statuya cihê nû dike. Ji ber ku di statuya Rêber Apo, rewşa wî ya jiyanî û xebatê de guhertinek çênebûye. Ev rewşa heyî jî mirov dikare bi polîtîkayên tecrîdê re, girê bide. Belê carinan agahî ji Îmralî tê û hevdîtin bi Rêber Apo re çêdibin û di wir de muzakere didomin. Lê belê ev saleke em dibêjin şert û mercên fîzîkî yên Rêber Apo nûjen bikin û ji aliyê azadiya fîzîkî ve gavan baivêjin. Herwiha ji bo ku rêbertî birêvebirina pêvajoyê bike û hem jî şert û mercên xebatê yên fîzîkî bi azadiyekê pêk bîne, ev daxwaz hatine pêşxistin. Ji ber ku heger ev statu neyê destxistin û bi awayekî fermî neyê naskirin, dewlet dikare kengî bixwaze doza tecrîdê kêm bike an jî bilindtir bike, ev hemû jî bi nêzîkatiya dewletê ve tên guhertin. Lê belê niha gelê Kurd pêvajoyê ne tenê bi hewildanên rayedaran ve girêdayî dibînin. Ji ber vê yekê Rêber Apo her tim behsa pêvajoyê, kişandina fermiyetê, guhertinên bingehîn û herwiha statuya xwe dike. Em îro jî dibînin ku ev daxwaz çiqas girîng e, diyarkirina rewşa Rêber Apo, rewşa girtîgeha Îmralî û statuya gelê Kurd. Ev ji bo pêvajoyê û hem jî ji bo ku ev rewş di demên bê de bidome û mayînde bibe, hewceyî gavên fermî û biryardanên girîng e.



**Tirkiyê hesasiyet û girîngiya pêvajoyê li ber çavan nagire û xetmandinê di pêvajoyê de dide avakirin, hûn siyaseta dewleta Tirk çawa dinirxînin?**

Siyaseta dewleta Tirk ya îro, ji siyaseta sed sal berê ya li ser înkara gelê Kurd, dijminatiya li hember gelê Kurd ava kiriye, ne cuda ye. Heger şert û mercên Rojhilata Navîn, cîhanê, konjektora Tirkiyê û hêza Tirkiyê hemberî gelê Kurd de, nehata guhertin, di siyaset, hişmendî û feraseta dewleta Tirkiyê de jî, tu guhertin nebana. Em dikarin vê pêvajoyê bi berxwedana sedan salan re girêdayî bikin. Di van sed salan de, dewletê xwest ku li Bakurê Kurdistanê polîtîkayên redkirin, înkar, tunekirin, pişanftin û komkujiyê pêş bixe, gelê Kurd jî tune bike. Lê gelê Kurd di van sed salan de li ber xwe daye û rastiyek nû ava kiriye. Heger bi destê dewleta Tirkî bûya, ev pêvajo belkî qet nebûya. Lê îro şert û merc hatine guhertin wekî têkiliyên dewletan, rewşa Sûriyê û Îraqê hatine guhertin, rewşa Îranê jî hêdî hêdî tê guhertin. Herwiha li Rojhilata Navîn her roj şer zêdetir û kûrtir dibe. Ev ne tenê li Rojhilata Navîn e, li Okranya, Rusya, Filistîn û Lubnan jî, şer her roj berfirehtir dibe. Di nav van şert û mercan de, Tirkiyê jî dît ku ev şerê bi sedsalan li hember gelê Kurd dimeşîne, bê encam maye. Herwiha qeyranên aborî jî, ji ber vê şerî, roj bi roj girantir bûne û dewlet gihîşt xetmandineke mezin. Di heman demê de, gelê Kurd bi Şoreşa Rojava û berxwedana xwe nav û dengê xwe li tevahî dinyayê belav kir. Îro Kurd gihîştine astekê ku nikare bên înkarkirin. Ji ber vê yekê, di van şert û mercan de, Tirkiyê mecbûr ma ku pêvajoyek nû bimeşîne.

Niha jî Tirkiyê, bi vê mecbûrbûnê an jî di van şert û mercan de, pêvajoyê her tim bi awayekî pêşde bibe, nade meşandin. Ji ber ku di wir de rewşa Rojhilata Navîn, Îranê, Rojava û Iraqê, şerê herêmê, hevsengiyên cîhanê dişopîne û li gorî wê biryaran dide. Heger şert û merc biguherin, dibe ku pêvajo bi dawî bibe an jî berdewam bike, ev jî li gorî berjewendî û hesabên xwe mêzênekî siyasî dimeşîne. Em dikarin bibêjin ku di helwesta dewleta Tirkiyê hemberî Kurdan de, guhertineke mezin a aliyê başbûyînê, nehatiye çêkirin. Yê ku pêvajoyê dimeşîne jî diyar, gelê me û Rêber Apo vê rastiyê baş dizanin. Em jî vê pêvajoyê ne li ser esasên baweriyê dimeşînin, lê li ser esasê muzakereyek demokratîk dimeşînin. Lê ev pêvajo ji bo Tirkiyê gelekî girîng e. Tirkiyê jî baş dizane ku qeyranên li hundirê welêt girêdayî vê şerê ne, heger ev şer bidome, ew qeyran jî dê zêde bibin. Lê heger şert û mercan de guhertin çêbibin jî, Tirkiyê mêzên xwe li gorî wê nû dike. Niha jî şerê Îranê, rewşa Rojhilata Navîn, helwesta Amerîka û Îsraîlê dişopîne û li gorî wê hewildan û reftarên xwe diguherîne. Di vir de ya ku dikeve ser milê me, avakirinek bi rêxistin û xwedîderketinek xurt pêk bînin, da ku em van mêzênan bizîvirînin aliyê xwe. Êdî gelê Kurd divê hesabê xwe bike. Tirkiyê reftar, helwest û şêwazên xwe li gorî pêvajoyê diguherîne, lê gelê Kurd divê her tim konjonktûr û rewşa heyî ji bo xwe bi awayekî baş bizivirîne, herwiha rê û rêbazên xurtkirina meşandina pêvajoyê bixe pêşiya xwe.

**Gavên di nava pêvajoyê de hatin avêtin, çi guhertin bi xwe re anîn bi taybet avakirina komîsyonê, herwiha partiyên Tirkiyê heya çi astê ne tenê weke nav, lê bi partîkê, cihê xwe di nava pêvajoyê de girtin?**

Avakirina komîsyonê û pêşçûnên pêvajoyê li Tirkiyê rewşa heyî sedî sed guherand. Hem di aliyê sosyolojîk û civaknasînê de, hem di aliyê dironiya takekesî, aborî, polîtîka û zimanê siyasî de, herwiha di helwestên desthilatdaran de, helwesta AKP û MHP’ê, em dikarin bibêjin guhertinên berbiçav çêbûn. Lê ev guhertin, nebûn sedema guhertina bingehîn a pergalê. Rast e niha li Tirkiyê gelek tişt ne wekî salek berê ne, gelek rewş hatin guhertin û ev guhertin gelek caran radîkal bûn. Lê em dixwazin ku ev guhertin li Tirkiyê mayînde bin. Ji bo ku mayînde bin, divê zagon û mekazagon werin guherandin an jî nûjenkirin. Avakirina komîsyonê di destpêkê de meclis kir cihekî çareserkirina pirsgirêkan. Berê meclis rol û misyonê xwe di çareserkirina pirsgirêkên civakî de winda kiribû û gel hêviyên xwe ji meclisê qut kiribûn. Meclis zêdetir bûbû amûrekî erêkirinê. Lê piştî avakirina komîsyonê, çûn û hatinên mirovan, saziyan û beroyan li meclisê zêde bûn. Ji ber ku heger meclis di pirsgirêkeke mezin a mîna pirsgirêka gelê Kurd ya ku bi çar dewletan û bi gelek aliyên din yên cîhanê ve têkildar dike, îradeya çareseriyê nîşan bide, ev ji gel re peyamê dide ku meclis dikare pirsgirêkan çareser bike. Ji ber vê yekê, hem ji aliyê saziyan û hem jî ji aliyê kesên ku di civakê de pirsgirêk dijîn, gelek kes hatin meclisê wekî cihê îradeya çareseriyê dîtin û hêviyek li wir dîtin. Ev hêvî jî bi avakirina komîsyonê û bi îradeya Rêber Apo re zindî bû. Şêwaza demokrasiyê li Tirkiyê de piştî vê avabûnê pêş ket. Nêzîkî 300–400 sazî, her yek bi ramanên cuda, hatin û fikrên xwe li meclisê parve kirin. Ev jî di dîroka Tirkiyê de yekem car çêdibe. Di nav wan de hem malbatên şehîdên gerîla, malbatên eskeran, çerdevan, mele, jin, ciwan, saziyên ku gundên wan hatine şewitandin, dayikên aştiyê û hwd… hebûn. Yanî curbecur deng û raman li wir cihê xwe girtin. Ev jî şêwazekî hestiyarî, naskirin û nêzîkatiyeke nû di meclisê de ava kir. Lê belê, heger ev hemû bi gavên fermî neyê mayendekirin, ew ê negihêje armanca xwe. Rast e guhertinek çêbûye, lê ev guhertin dikare demkî bimîne. Ji bo ku demkî nebe, divê gavên fermî werin avêtin. Herwiha rapora komîsyonê ku piştî avabûnê hat nivîsandin, di hundirê xwe de hin gavên girîng dihewîne. Lê ew gav ne têrkerin, hinek gavên din hene ku divê demildest werin pêkanîn, lê heta niha ev gav nehatine avêtin. Ev jî bi xwe baweriya meclisê di nav gel de kêm dike.

**Ji bo pêşedbirina pêvajoyê plan hene ku zextê li dewleta Tirk bike?**

Helbet ji destpêkê heta roja îro, me behsa kişandina dewleta Tirkiyê di pêvajoyê de kir. Desthilata AKP û dewleta Tirk tu carî bê zext, nabe demokratîk, gavên şênber jî naevêje û ji bo gelan jî zagon û mekazagonan çêneke. Her tişt bi rêxistinbûn û bi hêza hundirîn tê çêkirin. Ji ber wê bi hemû saziyên me re, me civîn bi gel re çêkir û nerînên gel girt. Di van civînan de, wek Rêber Apo jî di hevdîtinên xwe de anî ziman, “Pêşengê vê pêvajoyê gel bi xwe ye.” me jî xwest vê peyamê di civînên gel de diyar bikin. Ne ku em bendewariyê li dewletê bikin ku hin tiştan bike. Lê em bi xwe wek kirdeyên vê pêvajoyê tevbigerin, gavên xwe bavêjin, helwestên xwe nîşan bidin û kar û xebatên xwe bi rêxistin bikin. Ev tişt me di civînên gel de li her bajarî anî ziman. Ji ber vê yekê, piştî niha jî heger xetmandinek hebe û ev xetmandin bo were çareserkirin, divê gel rêxistina xwe xurt bike û hem jî daxwazên xwe bi dengekî bilindtir bîne ziman. Herwiha ji bo pêşxistina pêvajoyê, divê bi kar û xebatên çalak tevbigerin. Bi taybetî jin û ciwan, Rêber Apo avakirina û pêşveçûna vê pêvajoyê bi pêşengtiya wan re girê dide. Ji ber vê yekê, di her qadê de, gerek wek Partiya DEM’ê û hem jî wek tevgerên jinên azad û ciwanan, rêxistin û berxwedan ji bo xurtkirina vê pêvajoyê bidin meşandin.

FENER



Idrîs Henan

## Hemwelatîbûn Şiyana Qebûlkirina Cihêrengiyan E!

Têgeha Entegrasyona Demokratîk, di bingeha xwe de hevtemamkirinek hevseng e. Ji naskirina nasnameyên çandî, olî û etnîkî bigire heta baweriya bi hev re jiyankirinê were, hemû jî kirin û pratîka wekhev û dadwer e. Lew re jî Entegrasyona Demokratîk, yek ji têgehên bingehîn ê tevna siyasî û civakî ya danesîna pergalê ye.
Îroj li cîhanê, di heyamekî pirengiya çandî, nasnameyî û daxwazên beşdariya siyasî û wekheviya civakî de, cîhan rûbirûyî veguherînên bi kok e. Êdî demokrasî ne tenê mekanîzmeya hilbijartin û guhertina destê desthilatdariyê ye, lê belê şiyana civakê ya qebûlkirina cudahiyên netew, ol, ziman û li ser bingeha edalet û wekheviyê, hevnaskirina hevbeş e.
Bi vê zanebûnê re mirov dikare mebesta Entegrasyona Demokratîk nas bike ku behsa pêvajoya tevlîkirina wekhev a hemû kes û koman di nav tevna civakî û siyasî de dike. Di heman demê de; beşdariya bi bandor a biryardanê, pesendkirina cudakariyên li ser bingeha ol, ziman û netew û wekheviya maf û berpirsiyariyê ye. Ji ber vê jî, entegrasyon, ne tenê bi hev re jiyankirin e, lê belê hevkariya rasteqîn li ser esasê hemwelatîbûna giştî ye.
Girîngiya naskirina vê mijarê jî wisa xwe dide der ji ber ku rasterast girêdayî aramî û ewlehiya civakê û hevgirtina wê ye. Lawaziya mekanîzmayên lihevkirinê, dikarin bibin sedema formên dûrxistin û marjînalîzekirinê ku bandor û encamên neyînî li ser aramiya siyasî û aşîtiya civakî dikin. Beramberî vê; serkeftina polîtîkayên Entegrasyona Demokratîk nîşaneya pijîna pergala demokratîk û şiyana wê ya hembêzkirina cihêrengiyan e.
Îroj li Sûriyê li ser bingeha vê danesînê di 29 Çileya îsal de, peymanek di navbera Hikûmeta Veguhêz û QSD de hatiye îmzekirin. Lê nêzîkatiyên nijadperest ên desthilata demkî ya Şamê, xuya dikin ku têgeha entegrasyonê ji aliyê wê ve bi qasî ku pişaftin û asîmîlekirina çandî be hatiye fêmkirin û dixwaze wisa jî bixe meriyetê. Ji bona wê jî hevsengiyên guhêrbar ên navdewletî û hewceya hegemoniyê ya bi tevgerên radîkal ên îslama siyasî re diçewisîne û bi keysbazî nêzî peymanê dibe. Ji lew re, rêzê ji peymanê re nagire û ji aliyên siyasî, çandî û civakî ve jî gelê Kurd û mafên wî yên zikmakî paşguh dike.
Aliyê siyasî ve dixwaze tek nerîna xwe ferz bike. Aliyê xizmetguzarî, tendirustî û perwerdeyî ve Rojava bê par hiştiye. Li dijî ziman û çanda Kurdî bê rêz e û nasnameyên cihêreng ên gelên Sûriyeyê nas nake. Ji ber vê yekê, derveyî xalên peymanê tevdigere û xisûsên fena, wekhevî, tevlîbûna nav siyaseta giştî û biryardanê, qedirdana pirengiyê û mafê hemwelatîbûna azad ên pêkhateyên Sûriyê binpê dike ku li şûna hemwelatîbûn kirarek azad be, wergirek kole dibîne.



# Di çanda kurdewarî de hunerên destên dayikan

Hunerên destên dayikan di çanda Kurdî de xwedî cihekî taybet û girîng in, ew ne tenê wekî pîşeyê ye, lê wekî parastina çand û kevneşopiyên dema berê tên dîtin.

**Aylîn Ehmed/ Qamişlo**

Hunerên destan ên dayikan, çandeke dewlemend û kûr a civaka Kurd û gelek civakên din ku bi ked, sebir û hunera destan têne afirandin. Ev huner ne tenê hewcedariyên malê dabîn dikin, lê di heman demê de nasname, dîrok û hestên dayikan jî vediguhezin nifşên nû.

**Girîngiya hunerên destên dayikan**

Hunerên destên dayikan ku wekî hunerên kevneşopî yên pîşesaziyê jî têne zanîn, di çanda Kurdî de cihekî pir girîng digirin. Dirûnkarî ne tenê çêkirina kincan e, di heman demê de ew vegotina çîrok, hest û huner e. Di dema berê de, dayikan karên destan wekî bingeha jiyana malê û aboriya malbatê didîtin. Ev kar ne tenê ji bo hewcedariyan, lê wekî hunerekê û nîşana kedê dihatin dîtin. Di wê demê de dayikan piraniya materyalên xwe ji xwezayê an jî ji lawirên ku xwedî dikirin peyda dikirin û piştire bi destên xwe çêdikirin.

**Fîrbûna Minewer Xalid ji hunerên destan re**

Weke ku tê zanîn di dema berê de wekî niha tiştên nûjen tune bûn, ji ber wê dayikan bi destên xwe tiştên pêwîst ji malên xwe re çêdikirin. Di wê demê de yek jê merşê odeyan tune bûn, ji ber wê dayikan pirçên lawiran duşiştin piştire bi destên xwe dikirin merş. Dayika Minewer jî bi destê xwe ew merş çêdikirin, di salê de wê du yan jî sê merş amade dikirin. Minewer jî di wê demê de alîkariya dayika xwe dikir û xwe perwerde dikir da ku ew jî wek dayika xwe perwerdeyî her tiştî bibe. Piştre Minewer jî perwerde bû û dest bi merşikên biçûk û hem jî yên mezin kirin û bi awayekî xweşik çêkirin.
Herwiha ji bo kelûpelên xwarinê jî dayika Minewer tûrik çêdikirin û kelûpelên xwe yên weke ard û birinc dixistinê, ji ber ku di wê demê de tiştek tune bû ku wan kelûpelên xwe bixinê da ku bê parastin. Ne tenê merş ji bo raxistinê bûn lê belê ji bo gelek tiştên din yên pêwist çêdikirin. Ji bo cilikên razanê, malbata Minewer her yek bi hiriyên pez pênc kîlo dikirin merş. Ji ber gelek dem ji hunerên destan re dixwestin, ji ber vê yekê dayikan bi rojan bi wan ve diman.

**Di dema berê de tişt nedihatin dabîn kirin**

Di demên berê de her kes li gundan jiyan dikirin û her tişt li gundan tune bûn. Dema ku Minewer dixwest hunerên destan çêkiriba, dema ku bavê wan çûba nava bajêr jê daxwaza tayan dikirin. Piştire bi destên xwe hunerên xweşik ji bo xemilandina dîwaran çêdikir û bi dîwarên xwe yên odeyan ve dikirin. Ji bilî hunerên dîwaran jî wan li ser balîfan bi wêneyên xweşik embroidery dikirin. Dema ku wan çek ji bazarên bajêr jî dikirîn li wêneyên ser wan çekan meyîze dikirin û li gor wan çêdikirin. Her tiştekî ku bala wan dikişand li gor wê tiştên xwe amade dikirin û çêdikirin. Her wiha wan wek torbeyan “Qewlik” bi hev ve çêdikirin û tiştên xwe yên weke ta, derzî û gelek tiştên din yên malê dikirin wan torbeyan de. Ji bilî van jî goreyên li mêjê û torbeyên Quranê bi ta û derziyê çêdikirin.
Di jiyan berê de li gundan bi kedên dayikan yên ku bi desên xwe çêdikirin da ku debara jiyana xwe bi wan bikin. Di wê demê de ya herî ku ked dida dayik bû, ji ber hemû tiştên mala xwe bi keda destên xwe çêdikirin. Dayik ne tenê di wê demê de karê hunera destan dikir, lê belê bi gelek tiştên din ve jî radibûn. Hunerên destan yên dayikan di wê demê de gelekî girîng bûn, ji ber hem ji bo debara jiyana xwe û hem jî weke xweşikbûnekê di malan de dihatin dîtin.
Weke ku tê ditin jî di dema niha de her tişt hatiye afirandin. lê her dem bi pêş ve diçe herî zêde hunerên destên dayikan yên dema berê derdikevin û di nava milet de bipêş dikevin. Niha careke din dayik bi hunerên destan yên dema berê ve



hatine girêdan û bi destên xwe wan çêdikin. Ne tenê li Rojava û di nava Kurdan de hunerên destan bi pêş dikevin, lê belê di hemû Cîhanê de hunerên destan bi pêş dikevin û mirov wan weke girîngiyeke dema berê dibînin û wan bikar tînin.

**Armancên hunera destên dayikan yên van salan**

Hunerên Destan armanc dike ku bi rêya rêzek çalakî û bûyerên ku ji hêla Wezareta Çandê ve bi hevkariya hevkarên xwe ve têne organîzekirin ji ber wê hunerên destan di dema niha de hem li herêmê û hem jî li navneteweyî pêş dikeve. Weke pêşketinên:
Bilindkirina hişmendiyê li ser girîngiya hunerên destan û rola wan di parastina nasnameya çandî de.-
-Zêdekirina beşdariya hunerên destan di aboriya herêmê de.
Pêşvebirina hebûna hunerên destan di jiyana rojane de û hwd e.

# Pirtûkxaneya Somer : 41 sal in hebûna xwe diparêze

**Esmihan Gedro/Qamişlo**

**Yek ji kevintirîn pirtûkxaneyên bajarê Qamişlo ku beriya 41 salan hatiye avakirin û heta niha jî taybetmendiya xwe parastiye, pirtûkxaneya Somer e. Bi dehê salan e di vê pirtûkxaneyê de tevî hemû şert û mercan, zanîn, çîrok û dîrok hatiye parastin û hembêzkirin.**

Pirtûkxane ji destpêka avabûna xwe ve dibe cihê parastina zanîn, çand, çîrok û dîrokê. Di nav pirtûkxaneyên kevn de gelek pirtûkên destnivîs, belgeyên dîrokî û nivîsarên girîng hene ku salan berê hatine nivîsandin. Hinek ji wan bi sed salan kevintir in û hêj jî tên xwendin. Ji xwe atmosfera pirtûkxaneyeke kevn pir caran bêdeng û aram e.
Yek ji pirtûkxaneya herî kevin li bajarê Qamişlo pirtûkxaneya Somer e ku 41’sal in tevî hemû



şert û mercên zehmet ku herêm têre derbas bûye, çanda xwe ya pirtûkxaneyê hîna diparêze.

**Pirtûkxaneya Somer ji kevintirîn pirtûkxaneyên Qamişlo ye**

Pirtûkxana Somar ji salên 1985’an ve li Qamişlo hate vekirin. Di vê pirtûkxaneyê de pirtûkên cûda, roman û çîrok hene, di gel pêwîstiyên dibistanê de. Kalemêrê 70 salî Îsa Fistentîn Sûmî ku 8 sali in li vê pirtûkxaneyê kar dike wiha got: “Temenê pirtûkxaneyê bi xwe ji salên 85”an ve ye. Di vê demê de çûn û hatina kirîdaran ji bo kirîna pirtûk û romanan kêm e, sedemên wê vedigere ji ber rewşa aborî û rawestandina berîdê ye.”
Bûhayên pirtûkan ji 20 hezaran heta 50 hezar lîreya Sûrî ne. Di pirtûkxaneyê de pirtûkên bi zimanê cûda hene mîna pirtûkên bi zimanê Erebî, Kurdî, Suryanî, Ingilîzî û Ermenî û hwd. Ji ber rewşa aborî li bajar kirîn û firotina pirtûkan kêm dimîne girêdayî wê Îsa Sûmî dibêje ku: “Kesên ku nayên serdana pirtûkan nakin ji ber ku rewşa darayî xirabe, her wiha kesên feqîr nikarin bikirin. Û ji sedemên zehmetiyên kar ew e ku ji ber dibistan hatine girtin. Ji bilî wê dema ku dibistan vekirî bûn xwendekar dihatin serdana pirtûkxaneyê dikirin û pirtûk dikirîn.”
Çanda xwendinê li bajarê Qamişlo bi pirsgirêkên aloz re rû bi rû ye. Tevî dîrokeke çandî ya dewlemend, şert û mercên heyî di hin serdeman de bûne sedema kêmbûna xwendinê. Herwiha rewşa dawî ya ewlehiyê û şer bandor li ser civakê kir. Tirs û bê îstîqrariya berdewam ya li herêmê hişt ku mirov ji kirîna pirtûkan dûr bikeve û balê dikşîne ser dabînkirina pêdiviyên bingehîn. herwiha xwendin hişê me bi raman û xeyalên nû tijî dike. Hişê mirovan dikare têgeh û xeyalên berfireh ên li derveyî vê dinyayê bigire û bi saya pirtûkan, derfetên me yên cihêreng û berfireh hene ku em bi berdewamî fêr bibin û ji çîrokên cihêreng feydeyê bistînin. Li herêmê serdestiya medya civakî, teknolojiya nûjen û malperan bandor li guhertina şêwazên xwendinê kirine û gelek kes li şûna xwendina kûr a pirtûkên kaxezî berê xwe dane naveroka dijîtal a bilez. Tevî veguherînên dîjîtal, pirtûk yek ji girîngtirîn amûrên zanînê dimînin, ku ji xwendevanan re derfeta lêkolîn, analîz û ramanê ya kûr pêşkêş dikin.



Remezan Olçen

## Keleha hişê dij-mêtinger

Ji bo gelekî mîna Kurdan ku sedsalan bi polîtîkayên asîmîlasyon, qedexe û tunekirinê re rû bi rû maye, zargotin-folklor ne tenê berhevokek çîrok û stranên kevn e; ew bixwe mekanîzmaya man û nemanê ye. Di nava kurdî de, zargotin wekî “hişê kolektîf” kar dike û di avakirina hişekî dij-mêtinger de xwedî roleke stratejîk e.
Mêtingeriya modern ne tenê axê dagir dike, berî her tiştî hewl dide “hiş” û “ziman” dagir bike. Dema ku zimanê nivîskî tê qedexekirin û dibistan dibin navendên asîmîlasyonê, zargotina Kurdî wekî “dibistaneke gerok” derdikeve pêş. Çîrokên mîna Mem û Zîn, Keleha Dimdim an jî destanên mîna Dewrêşê Evdî, tenê behsa evîn û şer nakin; ew sînorên nasnameya Kurdî di hişê her zarokekî de xêz dikin.
Zargotin, bi rêya dengbêjî, çîrokbêjî û metelokan, dîroka rastîn a gel ji bin destê mêtingeran derdixe û radestî nifşên nû dike. Ev yek rê li ber “bîrçûna dîrokî” digire. Hişê dij-mêtinger tam li vir şîn dibe: Gava ferd fêm dike ku xwedî çandek, lehengiyek û zimanekî dewlemend e, êdî “bindestiya ruhî” dişkê.
Heke zargotin keleha berxwedanê be, jinên Kurd mîmar û parêzvanên herî mezin ên vê kelehê ne. Jinan bi veguhestina zargotinê cewherê neteweyî jî parast.
Zarokê Kurd yekemîn hîmên nasnameya xwe bi lorîkên dayika xwe digire. Lorîk ne tenê ji bo xewê ne; di nava wan de felsefeya jiyanê, êşa welat û daxwaza azadiyê heye. Ev, yekemîn “vaksîna” dijî asîmîlasyonê ye.
Dapîrên Kurd bi çîrokên “Hebû Tunebû” re, kodên exlaqî û civakî yên Kurdewarî vediguhêzin nifşên nû. Jin, di vir de ne tenê veguhestina çîrokan dike, di heman demê de “zimanê dayikê” di paqijtirîn halê de diparêze.
Jinên Kurd bi rêya zêmaran dîroka qetlîam û berxwedanan tînin roja me. Dema ku mêtingeriyê xwestiye ser dîrokê bigire, jinan bi qîrîna xwe ew dîrok zindî hiştiye.
Mêtinger her tim hewl dide bindest bide bawerkirin ku çanda wî “paşverû”, “gundî” û “bêqîmet” e. Zargotina Kurdî bi estetîka xwe ya kûr, bi mîtolojiya xwe ya dewlemend wekî Şahmaran an Kawayê Hesinkar vê îdiayê pûç dike.
Ji bo gelê Kurd, folklor ne muzexaneyek e ku mirov tê de bigere; ew manîfestoyekî siyasî ye. Her govendek ku tê girtin, her kilamek ku tê gotin, li hemberî hewildanên “yeksankirinê” yên dewletên mêtinger, îradeya “ez he me” ye.
Di sedsala 21’ê de, li hemberî levîathana mezin a globalîzmê û mêtingeriya çandî, vegera li zargotinê ne paşveçûn e, berovajî wê, xurtkirina kokan e. Divê em zargotinê ne tenê wekî tiştekî folklorîk, lê wekî “zanista berxwedanê” bibînin. Rola jinê di vir de kilît e; ji ber ku heta dayikek bi kurdî lorîkan bibêje û çîrokan veguhêze, tu sîstemeke mêtinger nikare serkeftina xwe ya dawî ragihîne.

# Qedexeya hawirdekirinê metirsî û zextên lêçûnên jiyanî zêde dike

Komîteya Niştimanî ya Hawirdekirin û Hinardekirinê li Sûriyê, di rêya biryarekê de hawirdekirina hin ji berhemên çandiniyê di sala 2026'an de li gorî roznameya çandiniyê qedexe kir, ev biryar wekî gaveke bi fikar tê wesifandin bi taybet di nava rewşa aborî ya xirab ku Sûriyê tê de dijî.

**Lîloz Hisên**

Ev biryar di demekê de ku Sûriyê bi pirsgirêkên aborî yên mezin re rû bi rû ye, tê, ku êşê ji qelsbûna pereyên herêmî û bilindbûna enfelasyonê dikşîne. Li gorî biryarê, hawirdekirina hêk û mirîşkan(Cemidî û taze) bi giştî, di heman demê de qedexekirina hawerdekirina kartol, sîr, xiyar û xirtikan, ev berhem wê ji destpêka meha Gunalê biryara qedexekirina wê bê kirin û 6 mehan wê berdewam bike heya meha Cotmehê. Herwiha qedexekirina bacan û bacanê reş, îsotê kesk, zebeşên sor û zer ji destpêka Hezêranê heya dawiya Cotmehê.

Di biryara ku hikumeta demkî ya Sûriyê derxistiye, qedexe li ser hejmarek ji cureyên fêkiyan jî dihewîne, di nav de guîz, mişmiş, xox û kerez, wekî din îsotên sor, hêjîr û tirî heya 31 meha kanûna 2026'an.

Rêveberiyên gumrikê ji bo bi bicihanîna biryarê û şopandina pêkanîna wê li ser deriyên sînor hatin erkdarkirin.



Hikumeta Sûriyê ya demkî îda dike ku ew bi vê pêkanînê hewil dide ku parastina helberîna çandiniyê ya herêmî bike, herwiha derfetên kar bifirîne di heman demê de girêdayîbûna bi hawirdekirinê kêm bike.

**Biryara qedexekirinê rastî bertek û pirsan hat**

Biryara hikûmeta demkî ya Sûriyê, ji bo qedexekirina hawirdekirina mirîşk û hêkan, digel berhemên çandiniyê, gelek fikar û metirsî, nemaze bandora wê li ser bazarên herêmî û bi taybet li ser debara welatiyan derxistiye holê.

Herwiha pisporên ku di vî warî de mijûl didin dibînin ku tedbîrên wiha, eger ji hêla zêdebûnek rastîn a hilberîna navxweyî ve neyên piştgirî kirin, dê bibin sedema encamên neyînî.

Sînordarkirina hawirdekirinê di çarçoveya daketina nirxê lîreya Sûrî, bilindbûna lêçûnên helberîn û veguhestinê dibe ku zextê di aliyê peydakirinê bike û derî li ber pêlek nû ya enflasyonê veke, nemaze ji bo kelûpelên bingehîn.

Di vê derbarê de aborînasê bi navê Misewec Selam li ser bandora vê biryarê li ser asta jiyanî ya gelê Sûriyê kir.



Misewec Selam di destpêkê de diyar kir ku di cîhanê tevî de niha şerekî aborî mezin heye û wiha anî ziman: "Di Sûriyê de bi taybet gelek şer û pevçûn tê de hate kirin, ji ber vê yekê zirar gihaşt xaka Sûriyê bi giştî di hemû warên jiyanî û binesazî de jî. Dema ku rêjîma Baas'ê hat rûxandin, hikumeta demkî hat erkdarkirin ji bo bi rêvebirina vê qûnaxê. Sozê ku hikumeta demkî dane milt pir giran dimeşe û tiştekî ku xizmeta gel bike nekiriye."

**Biryara qedexekirina hawirdekirinê barê welatiya girantir dike**

Misewec Selam bal kişand li ser biryara ku vê dawiyê hikumeta demikî derxist ji bo qedexekirina hawirdekirina madeyên xwarinê û wiha got: "Ez bawer nakim ku dê ev biryar bikeve bin xizmeta gel de, ji ber ku niha Sûriyê di rewşeke aborî giran de derbas dibe, berovajî wê barê welatiyan girantir bike. Idakirina hikumetê ji bo parastina helberîna çandiniyê ya herêmî bike dibe ku pêk bê, ev yek jî dema ku têrkirina xweser hebe wê baş be, lê bi vê yekê ez nabînim ku wê bikeve xizmeta welatiyan di heman demê de wê rewşa aboriyê zêdetir zehmet bike."

Aborînas Misewec Selam wiha gotina xwe qedand: "Hikumeta demkî bêyî ku bingeheke xurt ava bike van biryaran derdixe, lê ji bo ku karibe helberîna herêmî zêde bike, divê di destpêkê de şert û mercên di aliyê aborî de xurt bike. Ez bawer dikim ku di dema pêş de wê di Sûriyê giştî de zehmetiyên aborî derkevin."

# Hewldanên amdekirina stasyona Elok ji bo xebitandinê berdewam dike

**Navenda Nûçeyan**

**Rêveberê Stasyona Elektrîkê ya bajarê Dirbêsiyê Ciwan Ehmed diyar kir ku hemû tedbîrên têkildarî çêkirina stasyona Elok li herêmên Rêveberiya Xweser hatine temamkirin û got: "Niha erkê temamkirinê dikeve li ser milê hikumeta demkî ya Sûriyê ye."**

Heya niha pirsgirêka çareserkirina stasyona Elok ya avê berdewam dike. Li hember vê yekê hewildanên çareserkirinê jî têne kirin, di vê dawiyê de Desteya Enerjiyê ya Rêveberiya Xweser a kantona Cizîrê bi armanca gihandina enerjiyê ji bo Stasyona Avê ya Elok da ku bixebite û av bighêjê her kesî, di dîroka 6'ê meha Nîsanê de stasyonek gerok ji Rimêlan bir bajarê Dirbêsiyê bir.

Di derbarê mijarê de rêveberê Stasyona Elektrîkê ya bajarê Dirbêsiyê Ciwan Ehmed ji rojnameya me re axivî.

Ciwan Ehmed di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: "Hemû tedbîrên têkildarî çêkirina stasyona Elok li herêmên Rêveberiya Xweser hatine temamkirin. Niha erkê temamkirina wê dikeve li ser milê hikûmeta demkî ya Sûriyê ye, ku berpirsyartiya cihê stasyonê li Serêkaniyê dike."

**Qonaxên sererastkirina stasyona Elok ya avê**

Ciwan Ehmed bal kişand li ser qûnaxên çeksazkirina stasyonê û wiha got: "Stasyoneke gerok ji aliyê Desteya Enerjiyê ya Rêveberiya Xweser ve hate amadekirin û ji bo stasyona Dirbêsiyê hat şandin, da ku elktrîkê ji bajêr re peyda bike, di heman demê de avê ji bo stasyona Elok mîsoger bike. Niha stasyona Dirbêsiyê bi temamî amade ye da ku piştgiriyê bide syastona Elok ya avê."

**Çeksazkirina xeta Elok**

Ciwan Ehmed wiha lê zêde kir: "Piştî lêkolîna xeta ku stasyona gerok ya Dirbêsiyê û stasyona ava Elûkê bi hev ve girêdide, hat dîtin ku zirar gihaştiye xeta li devera Meşêrfa Zergan û li gundê Niwêhatê. Di 4'ê Gulanê de, xeta ku stasyona ava Elûkê ya li gundê Meşîrfe Zergan bi hev ve girêdide hat çeksazkirin, ji ber ku zirar gihaştibû sê fazên elektrîkê li ser dûrahiya 150 metreyan. Xebatên çeksazkirinê ji aliyê Daîreya Veguhestina Enerjiyê ya di Rêveberiya Xweser de hat kirin. Tenê xalek maye, ew jî gundê Niwêihat e, dê bi Xaça Sor re hevahengî were çêkirin da ku karibin bikevin gund û xetê sererastbikin ku bi vî awayî xet dê amade be ku elektirîkê ji stasyona Elok re dabîn bike."

Rêveberê Saziya elektrîkê ya bajarê Dirbêsiyê Ciwan Ehmed



wiha gotina xwe qedand: "Saziya ava vexwarinê û kanalîzasyonê ya li bajarê Hesekê jî, ji bo çeksazkirina stasyona Elok ku ji ber êriş û binpêkirinên artêşa dagirker a Tirkiyê û çeteyên wê zirar gihaştibûyê, dixebite."

Stasyona ava Elokê yek ji girîngtirîn stasyonên herêmê ye, ji ber ku ew çavkaniya sereke ya ava vexwarinê ya bajarê Hesekê ye. Ji ber vê yekê, hewl li ser vegerandina dabînkirina elektrîkê ji bo stasyona elektrîkê ya Dirbêsiyê hatine dayîn da ku jinûve dest bi xebatê bikin.

Stasyona Elok, avê ji bo bajarê Hesekê û gundewarê wê herwiha ji bo hin beşan ji bajarê Til Temirê û gundewarên parve dike. Wekî em dizandin Stasyona Ava Elok di bingeha xwe di ji hêla stasyona Serêkaniyê tê piştgîrkirin, lê ji ber êrişên dagirkeriya Tirkiyê li ser stasyonê di sala 2019'an de ji xizmetê derket.



# 'Zimanê me hebûna me ye'

Rêveberiya Komîteya Perwerdeyê ya Qamişlo Mizgîn Osê diyar kir ku perwerdeya bi zimanê Kurdî ji bo gelê Kurd xwedî cihekî pir girîng e û wiha got: "Divê zimanê Kurdî jî weke zimanê fermî yê Sûriyê di destûrê de were qebûlkirin."

**Solîn Mihemed/ Qamişlo**

Di pêvajoya entegrasiyonê de li Rojavayê Kurdistanê, heta niha zimanê Kurdî weke zimanekî ji aliyê hikumeta demikî ve bi fermî nehatiye qebûlkirin. Di derbarê mijarê de Rêveberiya Komîteya Perwerdeyê a Qamişlo Mizgîn Osê ji Rojnameya me re axivî.

**'Entegrasyon divê li ser bingeha cihêtiyên zimanî û çandî were avakirin'**

Mizgîn Osê di destpka axaftina xwe de wiha got: "Ya herî girîng ji bo gelê Kurd perwerdeya bi zimanê Kurdî ye. Di dema rêjîma Baas de zimanê Kurdî qedexe bû. Tenê zimanê Erebî fermî bû. Lê piştî destpêkirina Şoreşa Rojava zimanê Kurdî bû esas û gelê Kurd bi zimanê xwe xwend di hemû qonaxê perwerdeyê. Lê em niha dibînin ku careke din hikûmeta demkî dixwaze zimanê me di



destûra Sûriyê ya nû de fermî qebûl neke. Em wekî mamoste, vê yekê wek kêmasiyeke girîng di pêvajoya entegrasyona demokratîk de dibînim. Entegrasyon divê li ser bingehê qebûlkirina cihêtiyên zimanî û çandî were avakirin."

**'Zimanê Kurdî hebûna gelê Kurd e'**

Mizgîn diyar kir ku zimanê Kurdî hebûna gelê Kurd e û wiha got: "Ji bo me Kurdan zimanê Kurdî ne tenê axaftine, lê ew hebûna me ye. Ew rêya ku gelê Kurd bi wê xwe nas dikin û bi civaka xwe ve girêdayî dimînin û çanda xwe diparêzin. Her peyv di vî zimanî de hestek û dîrokek di xwe de digire. Ji ber ziman ne tenê amûrek ji bo ragihandinê ye, lê belê ew stûna bingehîn a nasnameya neteweyî ye. Zimanê Kurdî nasname, dîrok, çand, huner û hwd diguhezîne û diparêze. Herwiha hest û ramanên me bi awayekî rast diyar dike. Gava ziman qels bibe, nasname jî qels dibe. Ji ber vê yekê girîngiya vê gelek mezin e. Ziman li ba me Kurdan gelekî girînge, ji ber vê yekê em qebûl nakin ku îro careke din zimanê me fermî neyê qebûlkirin. Îro me mamosteyan gelek ked di ber zimanê Kurdî de daye, ziman ji bo me her tişte. Ji ber dema ku di dibistanan de zimanê Kurdî tenê bibe madeyek wê gelek zirar bigêje xwendekaran êdî xwendekar nikarin zimanê xwe bi awayekî kûr fêr bibin. Herwih dibe ku bibe sedema kêmbûna baweriya wan bi zimanê xwe. Li ba xwendekaran êdî têgihiştina wan ya waneyên din jî dikare qels bibe, ji ber ku zimanê dayikê nayê bikaranîn. Ji ber Ji aliyê zanistiya perwerdeyê ve, fêrkirina bi zimanê dayikê yek ji şertên bingehîn ên serkeftina xwendekaran e."

**'Heya ku zimanê me fermî were qebûl kirin gereke em gavan bavêjin'**

Mizgîn di domandina axaftina xwe de anî ziman ku heya zimanê Kurdî fermî were qebûlkirin emêr di tekoşîna xwe de gav paşde neavêjin û wiha got: "Di vê rewşê de, rola civak, malbat û mamosteyan pir girîng e. Divê di malbatê de zimanê Kurdî bi awayekî berdewam were axaftin. Her wiha divê di dibistanan de, her çend şert û merc sînordar bin jî, zimanê Kurdî were teşwîq kirin. Berhemên çandî yên weke pirtûk, çîrok, helbest, şano zêde bikin. Divabê gelê Kurd bi rêbazên aştiyane daxwazên mafên zimanî bidin nasandin. Ev hemû gav tênkirin da ku ziman ne tenê bimîne, lê her weha bi pêş bikeve."

**'Daxwaza min ew e ku zimanê Kurdî fermî were qebûlkirin'**

Mizgîn Osê di dawiya axaftina xwe de bal kişand li ser daxwazên ji bo zimanê Kurdî û wiha got: "Daxwaza min wek mamoste ew e ku zimanê Kurdî fermî were qebûlkirin. Di hemû astên perwerdeyê de ji seretayî heta zanîngehê were bikaranîn. Her wiha pirtûk û materyalên perwerdeyî bi kalîte amade bibin. Mamoste bi awayekî profesyonel werin perwerdekirin. Ez bi hêvî me Polîtîkayên zimanî yên piştgirîker werin sepandin. Di heman demê de armanca dawî ew e ku zimanê Kurdî ne tenê biparêzin, lê bibe zimanekî xurt, zindî û pêşketî di tevahiya Cîhanê de."

# Entegrasyon e yan helandin e? Nakokiya di navbera nasname û navendîbûnê li Sûriya nû de

**Cemîl Xoce**

Nakokiya di navbera Rêveberiya Xweser û Hikûmeta Demkî ya Şamê de, êdî ne tenê nakokiyeke siyasî ye li ser mekanîzmayên pêkanîna peymanekê yan parvekirina desthilatên rêveberiyê ye. Ew bûye rûbirûbûneke eşkere di navbera du vîzyonên dijber de ji bo pêşeroja Sûriyeyê. Vîzyonek hewl dide ku modelekê li ser bingehê pirrengî, beşdariya civakê û naskirina nasnameyên cihêreng ava bike. Ya din jî, hewl dide ku dewleteke hişk û navendî ji nû ve hilberîne ku cihêrengiyê wekî gefekê dibîne ku divê were kontrolkirin.

Ji îmzekirina Peymana 29'ê Çileyê ve, xuya bû ku derfeteke rastîn heye ku li Sûriyeyê derî li serdemeke nû vebe. Ew derfet dikare li ser bingehê diyalogê li şûna rûbirûbûnê û li ser hevkariyê li şûna marjînalîzekirinê ava bibe. Lêbelê, pêşketinên heyî eşkere dikin ku rejîma Şamê dîlê hişmendiyeke kevnar dimîne ku her ezmûneke herêmî ya serbixwe wekî gefekê li ser yekdestdariya xwe ya li ser biryardan, nasname û desthilatdariyê dibîne. Di encamê de, rêya entegrasyonê hêdî hêdî veguheriye rewşeke astengkirina bizanebûn û fêlbaziyên siyasî.

Rêveberiya Xweser, peyman wekî derfetekê ji bo parastina yekîtîya Sûrîyê bi rêya formuleke nû ya li ser bingehê naskirina hevbeş û rêzgirtina taybetmendiyên cihêreng ên civakên herêmî dibîne. Ji ber vê yekê hişt ku saziyên xizmetguzarî, perwerdehî û tenduristiyê karê xwe berdewam bikin û kanalên hevrêziyê bi saziyên hikûmetê re ava kirin. Wekî din, di gelek dosyayên leşkerî û îdarî de nermbûneke zelal nîşan dide. Ev nêzîkatî vîzyonek nîşan da ku aramî bi tenê bi zorê nayê bidestxistin, lê bi avakirina rêveberiyeke hevkar ku heq dide civakan ku karûbarên xwe di çarçoveyeke neteweyî ya berfireh de bi rêve bibin.

Lêbelê, Şam bi hişmendiyeke cûda nêzî van gavan dibe. Hişmendiya wê li ser bingehê bindestkirina herêmê û ji nû ve entegrekirina wê di nav hiyerarşiyeke navendî ya girtî de ye. Li şûna ku ezmûna Bakur û Rojhilatê Sûrîyê wekî modeleke ku dikare di ji nû ve avakirina welêt de piştî şer, were dîtin, ew wekî rewşeke demkî ku divê hêdî hêdî were jihevxistin û bikeve bin kontrolê, nêzîk dibin.

Ev nakokî di dosyayên perwerdeyê de bi awayekî zelal xuya bû. Redkirina naskirina bawernameyên ji zanîngeh û saziyên di bin Rêveberiya Xweser de nikare tenê wekî prosedureke teknîkî yan qanûnî were fêmkirin, lê belê wekî beşeke ji hewldana ji bo têkbirina rewatiya exlaqî û çandî ya ezmûna herêmê tê dîtin. Desthilata navendî fêm dike ku naskirina perwerdehiyê tê wateya naskirina civaka ku ew hilberandiye û nasnameya siyasî û çandî ya li pişt wê disekine ye. Ji ber vê yekê pirsgirêk hîna çareser nebûye, tevî ku bandora wê ya rasterast li ser pêşeroja bi hezaran xwendekaran heye.

Heman tişt ji bo zimanê Kurdî jî derbasdar e. Ew bûye qada rûbirûbûna siyasî û çandî. Rakirina zimanê Kurdî ji tabelayên dadgehên li Hesekê û Qamişloyê, ne tenê gaveke îdarî ya bû, lê bi zelalî zihniya ku cihêrengiya etnîkî wekî gefekê li ser yekîtiya dewletê dibîne, ne wekî çavkaniyeke dewlemendî û hêzê, îfade dike. Ev zihniyet bi dehsalan beşdarî kûrkirina krîza Sûriyeyê bûye, ji ber ku ew li ser ferzkirina yek nasname, desthilatdarî û yek çandê li ser civaka ku bi xwezayî cihêreng e hatiye damezrandin.

Hêrsa gel a ku piştî rakirina pankartan derketiye holê, ne tenê ji bo parastina gotinên ku li ser dîwaran hatibûn nivîsandin, bû, lê ew ji bo redkirina hewldana vegerandina civakê bo serdema înkar û dûrxistinê bû. Ji bo mirovan, ziman ne hûrguliyeke biçûk e, lê belê beşeke yekgirtî ya bîra kolektîf, hebûn û rûmetê ye.

Nakokiyên li ser Qesra Edaletê û saziyên herêmî jî eşkere dikin ku Şam hîn jî Rêveberiya Xweser bi nêrîneke wesayeta siyasî dibîne. Li şûna bikaranîna pisporî û jêhatîyên herêmî yên ku di salên şer de aramiya herêmê parastin, hewl didin ku saziyan li gorî modela burokrasiya kevneşopî ya ku bi tevahî di bin xizmeta desthilatdariya navendî de ye ji nû ve şekil bidinê. Ev tirsa rejîmê ji her rêveberiyeke civakî-bingehîn a ku xwedan xweseriyeke nisbî yan jî şiyana dayîna biryaran li derveyî kontrola navendî ye nîşan dide.

Di mijara jinan de, cudahiyeke îdeolojîk hîn bêtir eşkere ye. Modela ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê derketiye holê roleke siyasî, leşkerî û civakî ya bêhempa daye jinan û beşdariya wan kiriye pêkhateyeke bingehîn a avahiya îdarî û civakî. Lê rejîma li Şamê hîn jî di nav vîzyoneke kevneşopî de dixebite ku jinan wekî hêmaneke duyemîn di qada siyasî de dibîne. Redkirina naskirina Yekîneyên Parastina Jin (YPJ) û nebûna jinan ji gelek rêkeftinên hevbeş rave dike ku hişmendiyeke baviksalar nîşan dide ku ji her guhertineke rastîn di avahiya hêz û civakê de ditirse. Krîza heyî eşkere dike ku pirsgirêka bingehîn ne nebûna peymanan e, lê belê nebûna îradeya siyasî ye ku pirrengiya Sûriyeyê were qebûlkirin. Dewleteke ku li ser navendîbûneke mutleq û dûrxistina çandî were avakirin, aramiya rastîn çênake; di şûna wê de, ew heman nakokiyan bi şêweyên nû ji nû ve hildiberîne. Aramiya domdar hevkariyeke li ser bingehê rêzgirtina ji bo nasnameyên cûda û dayîna mafê beşdariya rastîn di rêvebirina karûbarên xwe de ji civakên herêmî re hewce dike.

# Sûriyê di navenda kirîza cîhanê de

**Şaho Xanim**




Şer û aloziya li cîhanê ku navenda wê Rojhilata Navîn e, gihiştiye lûtkeyê. Şerê Amerîka-Îsraîlê li dijî Îranê ket meha xwe ya sêyemîn, senaryoyek ku bi nebûna serketî an têkçûyî, berdewamiya rewşa bêçare ya leşkerî û nebûna asoyek zelal ji bo bidawîhatina vê pevçûnê tê xuyanîkirin. Her du alî jî tevî rawestina şer demê ji bo berjewendiya xwe bikar tînin û xwe wekî serkeftî nîşan didin. Ne hewldanên navbeynkariyê yên Pakistanê, ne jî helwestên hin welatên Rojavayî, ne jî redkirina çaverêkirî ya Çîn-Rûsyayê - ku dihat texmînkirin ku bêtir piştgirîya Tehranê bike di guhertina rêça şer an aştiyê de bi ser ketin.

Dikare were gotin herî zêde Rûsya ji berdewamiya şer sûd wergirtiye, ji ber ku ev yek bûye sedema bilindbûna bihayên petrolê û geşbûnek aborî, digel rakirina qismî a sînordarkirina li ser hinardekirina petrola wê.

Aliyê Amerîkî jî bi awayekî zelal dibêje ku ew dixwaze Îranê ber bi tiştekî dişibihe teslîmbûn, an jî qebûlkirina şertên wê, ku berjewendiyên Îsraîl û hin dewletên Kendava Erebî li ber çavan digire, bibe. Ew dixwaze peymanek aborî-ewlehî imze bike ku armanc dike Amerîka serdestiya Tengava Hurmuzê bike û hêzên leşkerî yên Îranê li herêmê sînordar bike. Di vê navberê de rêjîma Îranê di bin zext û bêserûberiya generalên xwe de û îdeolojiya wan ya berevaniya li dijî Amrîka-Îsraîl didomîne.

Ev alozî ji ber cudahiya armancên bingehîn a di navbera Washington û Tel Avîvê de hîn zêdetir kûr dibe; Amêrîka dixwaze şiyanên Îranê sînordar bike û dûv re bigihîje rêkeftinekê da ku pêşîniyên xwe li Asyayê û hevpeymaniyên xwe yên Rojavayî biparêze, lê Îsraîl şer wekî derfetekê dibîne da ku projeya herêmî ya Îranê bi tevahî hilweşîne û rêziknameya herêmî li gorî berjewendî û stratejiyên xwe ji nû ve şekil bide.

Bi van şert û mercan, rewş ji bo gelek senaryoyan vekirî dimîne. Ev şer, bêîstîqrarî û kaosa li Rojhilata Navîn zêdetir kir, bandorek neyînî li ser hemû aliyên jiyanê li herêmê û asta jiyana mirovan kir. Welatên ku jixwe nearam bûn mîna Sûriye, Iraq û Lubnanê êşên civakên wan zêdetir bûn. Heta welatên dewlemend ên Kendavê jî şahidiya pêlên revîna mirov û sermayeyê ber bi cihên ewletir û aramtir ve, kirin.

Sûrîyê jî ji vê rewşê bêpar nema ye û planên mezin yên hêzên navneteweyî li ser heye ku bibe navenda kaosa Rojhilata Navîn. Ji xwe Amerîka, Îsraîl, Qeter û Birîtaniyayê Sûriyê radestî Ehmed Alşeri kirin bi mercekî zelal, ew jî şerê li dijî Hizbulaha Lubnanî û Heşid Alşebî a Iraqî ye. Lê Ehmed Alşeri heta niha nikarîbû mercên wan pêk bîne û rewşa Sûriyê ber bi asoyekî ne diyar ve diçe. Niha li Sûriyê desthilatdarî kirîzeke kûr jiyan dike. Wêneya ku ji derve re tê nîşandan ji rastiya li ser erdê cuda ye. Hikûmeta demikî behsa saziyan, edalet, maf û serweriyê dike, lê ew bi serokên şer re di parvekirina desthilatdariyê û belavkirina talanê de mijûl dibe. Gendelî û nepotîzm pir zêde ne, di heman demê de aborî û hilberîn bi rastî jî rawestiyaye. Ji sozên devkî wêdetir, serwerî di xetereyê de ye: li Başûr, bandora Îsraîlê li ser qadeke erdnîgarî ya berfireh bicîh bûye; li Bakur, bandora Tirkiyeyê berfireh dibe hema dixwaze Sûriyê bi giştî kontrol bike, li rojhilat birçîbûn û bêaramî, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî entegrasyon e. Ev hemû valahiyek ewlehî û îdarî diafirîne, bi hilweşîna aborî û bêkariya berfireh jî re, rewş xetertir dibe.

Hikûmeta demikî bi destkeftiyên xwe yên li ser qada navneteweyî pesnê xwe dide, lê ew ji berpirsiyariyên xwe yên navxweyî dûr dikeve, ji her nîqaşek li ser ji nû ve avakirin, bêkarî, dabînkirina xizmetguzariyan û kêmbûna rojane ya hêza kirîna lîreya Sûrî dûr dikeve. Tevî kêfxweşiya destpêkê ya ku piştî hilweşîna rejîmê ji hêla gel ve hat hîskirin, wan hîn ne ewlehiya pêwîst û ne jî standardek jiyanê ya bingehîn tecrûbe nekirine. Krîz her ku diçe xirabtir dibe, ji bihayê nan, gaz, elektrîk û avê bigire heya hilweşîna dahatan li hember bihayên bilind, heya wê astê ku pira valahiyê pir dijwar derdikeve holê. Wekî din, dirûşmeya “Na ji konan re” tenê dirûşmeyek dimîne, ji ber ku binesaziya pêwîst ji bo vegera kesên koçber bo malên xwe nehatiye çêkirin.

Yek ji mijarên sereke li Sûriyê jî doza gelê Kurd e. Gelê Kurd bi giştî ji pêşeroja xwe û cihê xwe di nav dewleta Sûriyeyê de bi fikar in. Tevî cîbicîkirina hin xalên peymana 29’ê Çileyê, hikumeta demikî bi awayekî ne cidî nêzî entegrasyonê dibe û gelek xalên bingehîn paşguh dike. Yek ji nîşanên nebûna cidî û amadekariyê ji bo bicîhanîna peymanan, berdewamiya xîtaba kîn û nefretê ji aliyê hikûmeta demikî ve ye. Hikumeta demikî hîn jî zihniyeta xwe ya navendî israr dikin. Hin kesayetên di hikumeta demikî de bi israr dixwazin şerekî din bidin destpêkirin û herdem Kurdan û Rêveberiya Xweser reş dikin.

Salek tijî derbas bû di ser Konferansa Yekrêzî û Yekhelwesta Kurd a 26ê Nîsanê ku armanca wî bidestxistina mafê gelê Kurd di Sûriyê de bû. Lê heta niha tu karên berbiçav nehatine kirin û rewşa xebatên wan nediyar e. Salek tijî derbas bû, tijî bûyer û karesatên siyasî û leşkerî, ku di wan de bi taybetî Kurdan windahiyên leşkerî û siyasî yên mezin dan; ji êrîşên li ser Şêx Meqsûd û Eşrefiyê heta rewşa niha ku Rojava tê re derbas dibe, lê partiyên Kurdî yên ENKS’ê û Komîteya Yekrêziya Kurdî bêdeng man, ti daxuyanî, deklarasyon an jî çalakiyek siyasî an dîplomatîk pêşkêş nekirin. Ji ber vê yekê Hêviya ji bo pêkanîna pratîkî ya çalakiya siyasî ya kolektîf a Kurdan, an jî ji bo bidestxistina temsîliyeteke dadperwer ji bo pêkhate û partiyên cuda yên Kurd bi xwe, jî lawaz bûye.

Krîza siyasî ya heyî, ku vedigere ser dûrxistina mafên neteweyî yê gelê Kurd li Sûriyê û kêmkirina mafên civakî bo postên îdarî, dê bi redkirina gelê Kurd re rû bi rû bimîne. Ev hemû faktor pêwîstiya lezgîn a lidarxistina konferansek neteweyî ya berfireh, ku bê îstîsna nûnerên hemû beşên gelê Sûriyê tê de bin, destnîşan dikin. Ev konferans dê bingeha qonaxek nû ya li ser bingeha diyalog û hevkariya neteweyî ya rastîn, bê dûrxistin û bêalîkirin, deyne.

# Kîna hikumetê li hemberî zimanê Kurdî

**Reşo Mihemed**

Di destpêka Gulanê de li gundewarê Kobanê, piştî danîna pankêtên nû yên girêdayî şaredariya navçeya Çelebiyê, nakokî bi xwe re anîn. Di panketan de navên tenê bi Erebî hatine nivîsîn bêyî ku navê Kurdî li gel Erebî were bikaranîn, ev yek jî metirsiyên cidî afrandin.

Di vê pêngavê de hejmarek sazî, di nav de navenda tenduristiyê û avahiya şaredariyê, li herêmeke ku nifûsa wê piranî Kurd e, bi taybetî li bajarokên Çelebiyê û Xerab Işik û derdora wan, heta derdora kargeha çîmentoyê ya Lavarc li başûrê rojhilatê bajarê Kobanê. Vê yekê pirsgirêka nav û ziman di qadên giştî de a têkildarî naskirina mafê pêkhateyan, bi taybetî li deverên xwedî taybetmendiyeke çandî derxist holê.

Hikumeta demkî li bajarê Hesekê pankêta nasandinê ya li ser avahiya Koşka Edaletê ku bi zimanên Kurdî û erebî hatibû nîvisandin rakir û li şûna wê tabelaya bi zimanên Erebî û Ingilîzî hilda. Ev yek jî nerazîbûneke mezin ji aliyê gelê Kurd ve nîşan da. Cara bi şûn de zimanê Erebî tenê li ser pankêt bi zimanê Erebî navê saziya Edaletê hat nivîsîn.

Terzê hikumeta demkî yê guhertina zimanên pankêtan derveyî peyamna 29’ê Çileyê ye. Ew dixwaze tevlîheviyê ji bertekên xwepêşanderan derxîne. Gelê Kurd beriya hatina vê hikumetê li dijî Rêjîma Baas ji bo zimanê Kurdî berxwedanî kirine, gelê Kurd dilê xwe yê sar bi agirê Şoreşa Rojava germ dikir, piştî salên dirêj ji qerisîn û sarbûna hest û zuhabûna pênûsan, pûçkirina zimanê Kurdan, êdî gelê Kurd li gel şerê gelê şoreşgerî şoreşa ziman li dar xist. Gelê Kurd zimanê xwe parast, li pêş xist û di tevahiya saziyên Rojava bi cih kir, ne tenê zimanê Kurdî dihat û tê bikaranîn, lê belê pirziman, ev yek jî li gor taybetmendiya pêkhateyên Rojava yên çandî û civakî. Hikumeteke ku bi pirrengiyê bang dike, baweriya xwe bi pirçandiya gelên Sûriyê tîne, lê ev yek di çarçoveya siloganan de dimîne. Di pratîkê de hikumeta demkî siyaseteke qirêj dimeşîne, heman siyaseta rêjîma Baas, çawa ku Baas li ser hişmendiyekê li pêkhateyên ji bilî Ereb dinerî, hikumeta demkî jî bi heman nerînê ye. Piştî Şoreşa Rojava, evqas şehîd û cangorî, Kurdek dema derbasî saziyekê bibe yekser çavê wî li Erebî bikeve û zimanê wî neyê dîtin, ew ê rasteras xeyalên wî vegere serdema Baas. Wê polîtîkayên Baas ya li ser ziman, hebûn, nasname, çand û dîroka gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê. Ev yek jî ne omîda gelê Kurd û ne ya hemû pêkhateyên din bû.



# Kolonyalîzim û gelên di bin mêtîngeriyê de

Tevî pêşketinên girîng ên ku cîhanê di warê mafên mirovan û mafê çarenûsê yê gelan de bi dest xistiye jî, pirsgirêkên kolonyalîzim û serdestiyê bi awayên cûrbecûr li gelek deverên cîhanê berdewam dikin. Ev pirsgirêk ji ber girêdana wan bi pevçûn, nasname, mafên dîrokî û serweriya neteweyî di nav pirsgirêkên herî tevlihev û hesas ên siyaseta navneteweyî de dimînin.

**Zana Roj**

Bi hezaran salan e, cîhan têgeha kontrol û berfirehbûnê nas kiriye, ji ber ku împaratorî û dewletên bihêz hewl didin ku bandora xwe li ser ax û gelên din ferz bikin da ku dewlemendî, hêz û bandora leşkerî bi dest bixin. Her çend di hişê gelek kesan de peyva “kolonyalîzm, mêtîngerî” bi dewletên Ewropî yên nûjen ve girêdayî be jî, kokên wê vedigerin demên kevnar, dema ku împaratoriyên mezin dest bi berfirehbûna ji sînorên xwe kirin û civakên cîran xistin bin kontrola xwe.

Mêtîngerî yek ji diyardeyên herî bi bandor di dîroka mirovahiyê de ye, ji ber ku nexşeyên welatan guherand, bandor li çand û aboriyên gelan kir, û şopên ku îro jî li gelek deverên cîhanê hene hiştin.

**Destpêkên kolonyalîzmê di şaristaniyên kevnar de**

Lêkolînên dîrokî destnîşan dikin ku formên pêşîn ên kolonyalîzmê bi împaratoriyên kevnar ên ku ji bo kontrolkirina axên cîran ji hêla leşkerî û siyasî ve berfireh bûn, derketine holê. Împeratoriya Misirê ya kevnar ber bi herêmên Nubia û Bîlad el Şam ve berfireh bû, bi armanca parastina rêyên bazirganiyê û xurtkirina bandora siyasî. Împeratoriya Aşûrî bi hêza xwe ya leşkerî û kontrola xwe ya li ser beşên mezin ên Rojhilata Navîn jî dihat nasîn, li wir bandora xwe li ser gelek gelan dimeşand û çavkaniyên herêmên ku di bin kontrola xwe de bûn, îstismar dikir. Di qonaxên paşîn de, Împeratoriya Romayê sînorên xwe fireh kir û beşên mezin ji Ewropa, Bakurê Afrîqayê û Rojhilata Navîn girt nav xwe, û bû yek ji mezintirîn împeratoriyên dîrokê.

**Armancên wan împaratoriyan ev bûn:**

Berfirehkirina bandora siyasî, kontrolkirina rêyên bazirganiyê, bidestxistina dewlemendî û çavkaniyan û zêdebûna hêzên leşkerî.

**Mêtîngeriya modern û destpêka berfirehbûna Ewropî**

Her çendî kolonyalîzm ji demên kevnar ve hebûbe jî, lê belê tişta ku wekî “kolonyalîzma modern” tê zanîn bi awayekî zelal di sedsala 15’mîn a piştî zayînê de, bi destpêkirina rêwîtiyên keşfê yên Ewropî li seranserê deryayan dest pê kir.

Sefera keşifgerê Îtalî Kristof Kolomb di sala 1492’an de xalek girîng di dîrokê de nîşan da, piştî ku ew bi piştgiriya Spanyayê gihîşt parzemîna Amerîkayê ku dû re pêlek berfireh a berfirehbûna Ewropî li cîhanê dest pê kir.

**Welatên din ên Ewropî zû tevlî pêşbirka mêtîngeriyê bûn, ya herî berbiçav jî:**

Portogal, Brîtanya, Fransa û Holanda. Van welatan ber bi Afrîqa, Asya û Amerîkayê ve berfireh bûn, bender û tevahiya welatan kontrol kirin, û ji serdestiya xwe ya leşkerî û deryayî sûd werdigirtin.

**Armancên mêtîngeriya nûjen**

Hêzên kolonyal di dema berfirehbûna xwe de xwe dispêrin çend armancên sereke ku yên herî girîng ev bûn:
Kontrolkirina çavkaniyên xwezayî yên wekî zêr, petrol û biharatan, vekirina bazarên nû ji bo bazirganiyê, bidestxistina karkerên erzan, berfirehbûna bandora siyasî û leşkerî, her wiha kontrolkirina bi rêyên bazirganî yên cîhanî. Di heman demê de hin hêzên mêtînger hewl dan ku ziman û çanda xwe li ser gelên ku wan mêtînger kirine ferz bikin, û ev yek jî bû sedema guhertinên kûr ên civakî û çandî li gelek welatan.

**Bandorên kolonyalîzmê li ser gelan**

Kolonyalîzmê bandorek kûr li ser welat û gelên kolonîzekirî hişt ku hin ji wan heta roja îro jî berdewam dikin. Ew bû sedema: Talankirina çavkaniyên xwezayî, belavbûna xizanî û bêîstîqrariyê, parvekirina hin welatan û sînoran bi awayekî ku bû sedema pevçûnên paşê, paşketina çand û zimanên herêmî û derketina krîzên siyasî û civakî yên demdirêj.

**Dawiya kolonyalîzma kevneşopî**

Bi destpêka sedsala 20’an re, li gelek welatan tevgerên rizgariya neteweyî dest pê kirin ku daxwaza serxwebûnê û bidawîanîna serdestiya biyanî dikirin. Ev tevger piştî Şerê Cîhanê yê Duyemîn, dema ku hêzên kolonyal ên Ewropî ji hêla aborî û leşkerî ve lawaz bûn, zêde bûn. Di nav çend dehsalan de, piraniya welatên Asya, Afrîqa û cîhana Ereb serxwebûna xwe bi dest xistin, û qonaxek nû ya avakirina neteweyê dest pê kir. Lê belê ev nebû bidawîanîna mêtîngeriyê li ser hemû netew, etnîka, pêkhate û welatan ku heyanî roja îro jî gelek netew û welat hena di bin mêtîngeriyê de ne. Mînaka herî mezin jî Gelê Kurd ku di nava çar dewletan de hatiye perçekirin, Tirtiye, Sûriye, Iraq û Îran de.

Her çendî kolonyalîzma kevneşopî li piraniya deverên cîhanê bi dawî hatibe jî, bandorên wê yên siyasî, aborî û çandî îro jî diyar in. Gelek zanyar her wiha dibêjin ku cîhan şahidiya formên nû yên serdestiyê dike ku wekî “neokolonyalîzm, mêtîngeriya nûjen” têne zanî ku li şûna dagirkeriya rasterast a leşkerî, xwe dispêrin bandora aborî û siyasî.

Gelên resen kevintirên gelên ku ji welatekî ne û ji hêla komên hegemon ve hatine bindestkirin. Berî serdema kolonyalîzmê, bi sedan netewe û eşîr li seranserê axa ku paşê hatin kolonîzekirin bi cûrbecûrbûna ziman, ol û çandan, hebûn. Gelên ku paşê wekî gelên resen hatin nasîn, bajarên wan ên mezin, dewlet, eşîr, welat, padîşahî, komar, konfederasyon û împaratoriyên wan hebûn. Van civakan di warên huner, çandinî, endezyarî, mîmarî, matematîk, astronomî, nivîsandin, fîzîk, bijîşkî, avdanî, jeolojî, maden, pêşbîniya hewayê û warên din de xwedî astên cihêreng ên zanînê bûn. Ji ber bandorên kolonyalîzmê, gelên resen bi hilweşîneke mezin re rû bi rû man. Piraniya komên resen yên cîhanê, îro ji hin an hemî axên bav û kalên xwe hatine koçberkirin. Gelên resen her tim hebûn û rûbirûyê mêtîngeriyê hatin, dema ku ew hatin mêtîngerkirin, weke gelên resen û xwecihî nehatin hesibandin. Bi vê awayî asîmîlasyon dest pê kirin.

Gelên resen têkoşîna xwe didomînin ji ber ku ew li piraniya welatên ku ew bi gelên ne-xwecihî re dijîn rastî cudakariyê tên. Piraniya xelkên resen yên cîhanê di nav komên herî xizan de li welatên ku lê dijîn in, û ew ji sedî 19’ê xizanên cîhanê pêk tînin.













**Gel û kêmneteweyên ku hîn jî di cîhana hemdem de ji kolonyalîzm an serdestiyê cefayê dikişînin**

Tevî bidawîbûna serdema kolonyalîzma kevneşopî ku cîhanê di sedsalên nozdeh û bîstan de dît, gelek gel û kêmnetewe hîn jî îro di bin cûrbecûr awayên kontrol, dagirkirin, an jî dûrketina siyasî û çandî de dijîn. Cewherê kolonyalîzmê di serdema modern de guheriye. Ew êdî bi dagirkeriya rasterast a leşkerî ve sînordar nîne, lê niha kontrola li ser nasname, çand, aborî û mafên siyasî jî dihewîne.

Neteweyên Yekbûyî destnîşan dike ku mafê çarenûsî yê gelan yek ji prensîbên herî bingehîn ên hiqûqa navneteweyî ye, lê dîsa jî gelek doz û pirsgirêkên çaresernebûyî hene ku tevahiya nifûs ji şer, bêparî û cudakariyê cefayê dikişînin. Em ê di vir de di serdema nûjen de ango bi kolonyalîza modern re, çawa gelek welat û netew hene ku hê jî di bin dagirkerî û mêtîngeriyê de ne.

Kolonyalîzma modern şêweyekî serdestiyê ye ku ji hêla dewletên din an hêzên siyasî ve tê meşandin, çi dagirkirina leşkerî be, çi bandora siyasî be, an jî bandora aborî be.

Gelê Kurd: Gelê Kurd yek ji kevintirên gelên dunyayê ye û xwedî ol û baweriyên cuda ye. Dîroka gelê Kurd yek ji dîrokên herî kevnar û dewlemend ên herêma Rojhilata Navîn e. Kurd miletê xwedî kokên Arî ne û bi hezaran salan e li ser axa xwe ya bav û kalan, ango li Kurdistanê, dijîn.

Peymana Qesra Şîrîn û Parçebûn (1639): Di navbera Împaratoriya Osmanî û Sefewî de şerên dijwar qewimîn. Bi Peymana Qesra Şîrîn re, axa Kurdistanê cara yekem bi fermî di navbera van her du hêzan de hat dabeşkirin. Ev destpêka perçebûna Kurdistanê bû.

Sedsala 20’an Peymana Lozanê û Parçebûna Çaralî: Piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, nexşeya Rojhilata Navîn hat guhertin: Peymana Sêvrê (1920): Mafê avakirina dewletekê dabû Kurdan, lê nehat bicîhanîn.

Peymana Lozanê (1923): Kurdistan bi fermî bû çar parçe (Bakur, Başûr, Rojava û Rojhilat) û di bin serdestiya Tirkiye, Iraq, Sûriye û Îranê de ma.

Gelê Kurd di gelek qetlîaman re derbas bû û gelek serhildan û şoreş pêk anîn, şoreşa herî dawî jî ya Rojavayê Kurdistanê bû ya ku di Sûriyê de ji sala 2011’an ve dest pê kiriye û bi ser ketiye.

Gelê Filistînî: Di serdema nûjen de di nav gelên herî girîng de ye ku hîn jî di bin dagirkeriyê de dijîn (Dagirkeriya Israîlê). Ji sala 1948’an û vir ve û şer û pevçûnên piştî wê, Filistînî di bin şert û mercên siyasî û mirovî yên aloz de dijîn, bi taybetî li Difa Rojava, Şerîda Xezzeyê û Rojhilatê Qudis. Doza Filistînê di forumên navneteweyî û biryarên Neteweyên Yekbûyî yên derbarê mafê çarenûsî de bûye yek ji mijarên herî girîng.

Gelê Sahraya Rojava: Gelê Sahraya Rojava ji sala 1975’an vir ve, ji dema vekişîna kolonyalîzma Spanyayê ji herêmê ve, di nav pevçûnek siyasî ya dirêj de dijî. Eniya Polisario, ku beşek ji gelê Sahrayê temsîl dike, daxwaza avakirina dewletek serbixwe û referandûmek li ser diyarkirina xwerêveberiyê dike. Ev mijar hîn jî di navbera gelê Sahrayî û Rojava de mijara nakokiyê ye, di demekê de ku hewldanên navneteweyî ji bo dîtina çareseriyek siyasî ya mayînde hene.

Keşmîr: Herêma Keşmîrê yek ji herêmên herî aloz ên cîhanê ye, ji ber ku ji sala 1947’an vir ve di navbera Hindistan û Pakistanê de nakokî heye. Her wiha gelek Keşmîrî daxwaza mafê xwerêvebirinê û bidawîanîna şerê bi dehan salan dikin.

Rohingya li Myanmarê (Ew welatekî ye ku li rojavayê Nîvgirava Hindoçînê li Başûr Rojhilatê Asyayê ye): Li gorî gelek raporên navneteweyî, kêmneteweya Rohingya yek ji kêmneteweyên herî zêde rastî zordariyê tên li cîhanê tê hesibandin. Rohingya li Myanmarê dijîn û rastî koçberî û tundûtûjiyek berfireh hatine ku ev yek jî bûye sedema koçberiya bi sed hezaran kesan ber bi welatên cîran, bi taybetî jî Bangladeşê ve.

Uygûr li Çînê: Kêmneteweya Uygurî li herêma Sinjiang dijî, û rewşa wan di salên dawî de bala cîhanî kişandiye ser xwe.



Hafiz Ahmet Turhalli

## Xweşbînî û aştî

Pirsgirêkên me yên mirovahiyê bi kurahiya dîroka me ve girêdayîne. Em weke hebûnekî zindî çiqas di nav liv û tevgerê de bin, ewqas jî em di bin bandora çand û dîroka hawîrdora xwe ve pabendin. Dîroka mirovahiyê bi giştî, ya me û cînarên me bi taybetî, tije malwêranî û xwîn e.

Gelo mirovahî nikare hevdu xweş bibîne û di nava aşityeke mayinde de jiyanekî bidomîne? Dîroka Mirovahiyê zêdetir şer û pevçûn, xerakirin û malwêranî ye! Raste di hebûna beşer an bi gotinekî din hebûna xwedanê jînê de, hebûna ku herî zêde zerer û ziyanê digîhîjîne hevdu, mirov bi xwe ye. Hebûnên weke ajalan jî bêguman zerer û ziyanê dide hawîrdora xwe, lê ne weke mirovan.

Ajal tenê ji bo têrkirina zikê xwe, ji ber birçîbunê êrîşan pêk tînin. Êrîşên wan heta ziktêrbûnê ye. Şêrek, Hirçek an ajalekî dîtir, piştî zik û têrbûnê, tu êrîşên wî li ser derûdorê çênabin.

Di vî warî de hebûna herî xeternak mirove! Mirov bi milyonan ji hev dikujin, lê goştê hevdujî naxun! Pêşbirka hestên desthelatê însan kiriye, hebûna herî xerab. Bê guman ev xerakirin, talan û malwêranî, zêdetir di mirovan de bûye weke çand.

Gelo ev çanda ku di malbata mirovahîyêde cîh girtiye û bûye çandekî sereke, nikare were guhertin? Bê guman dijî vê desthelatê û nebaşiyê gellekî mirovan tekoşînên gelekî dîrokî kirine. Pêxember û kesên ku eqlû vijdana xwe bikar anîne, jibo aşitî û aramiyê tekoşînên granbuha dane. Piştre ew tekoşîna wan jî veguheziyê desthelatê û sernavê wan desthelatekî xwînrêj hatiye berdewamkirin.

Ev şer û pevçûnên ku îro li dinya me rû didin binirxînin, emê bi eşkere bibînin ku hemû desthelatdar ola û bîrdoziyan bi rengekî bê exlaq bikar tînin.

Şerê Rûsya û Ukranya, herdû alî jî bawermendên ola Hz. Îsa ne. Afganistan û Pakistan herdu jî misilmanin.

Di nav welatên ku misilman têde dijîn şer û pevçûnên navxweyî bi dijwarî berdewam dikin. Şerê Tirkan, Ereban û Farisan bi Kurdan re jî, şerekî ne rewaye û zordariya ser hebûn û xwezaya milletê Kurd e.

Em dema li Ezana me Misilman gohdar dikin, ku rojê pênc caran bang tê kirin: “Xweda mezintire, Xweda mezintire”, bi wateya ez mezintirîn hebûna ku Xwedê ye dipejirînim û ezê mezinahiyê ser tu kesekî nekim. Lewre ez jî ji van beşeran yekim, tu ferq û cudahiya min nîne.

Banga me Misilmanan, Çana xiristyanan û Şafara cuhiyan bangî alîgirên xwe dikin ji bo mezinahiya Xwedê bipejirînin û xwe mezin nebînin. Pêxember hemû dibêjin ji hevdû hez bikin, wekheviyê bicîh bikin, di nava aşitiyêkî mayinde de bimînin! Mirinjî weke heqîqetekî ji me re dibêje ey zindîno; hûnê bimrin, ez li benda we me, çavsoriyan nekin, zilmê li hev nekin, quretiyê nekin. Yên pêşiyên we aşitî û hevdu xweş dîtin bicîh nekirin, qene be hûn bihizirin û bi hev re nava aşitî û aramiyê de jiyanekî ava bikin. Kîbir û xwe mezin dîtin, li gor baweriyan exlaqê Îblîse! Pirsgirêkên me yên dîrokî û yê roja îro jî ji ber xwe mezin dîtinê û li ser henekiyan ferz kirinê ye. Kes an terefên xwe mezin dibînin bingeha xerbûnêne, navên wan Misilman, Cihû an xiristiyan jî kiryarên wan yên Îblîs in. Kesê kiryarên Îblîs di jiyana xwe de pêk bîne, navê wî Muhemmed, Îsa, Musa be jî di rastiyê de ew kesayet Îblîs e! Kesên aşitî û bihevre jiyanê diparêzin Rêhevalên Pêxemberanin û çanda wan dimeşînin. Werin em hemû bihevre ji bo, aşitî, aramî û dadweriyê hevkariyê bikin.